

Tevgera ku di 15'ê gelawêja 1984'an de bi çend kesan dest pê kir, li seranserê cîhanê deng vedide. Di raporên dewletên împeryalîst de PKK wekî rêxistina herî mezin û bi xetere tê binavkirin. Li aliyê din şerê qirêjî ku dewlata tirk li hemberî kurdan dimeşîn e, sîstema dewleta tirk bi temamî xitimandiyê. Dewlet bi temamî ketiye bin destê çeteyan. Sîstema cerdevaniyê li serê dewletê bûye bela. Êdî dewlet bêgav maye ku şer bi pereyên reş û narkotîkê fînanse bike.



Stêra 15'ê gelawêjê gestir dibe

Hevpeyvîn:

Astsubayê kurd Mustafa K...:
Wijdanê min got "êdî bes e!"

Rûpel 8-9

Zülküf Kışanak:

Embaz Ferhat Uzun,
Femandar Reşo

Rûpel 6

Mihri Belli:

PKK ji berê xurtir e û di warê
dîplomasiyê de jî pêşketî ye

Rûpel 11

NAVEROK



A. Bedran: Gera herî "xweş"

4



7

Ji PEN a KURD bang li nivîskar û weşanvanên kurd



dünyası

13

Serwisa Çandê: Kovara danasîna berhemên gelê Mezopotamyayê

Ji Xwendevanan

BI salên me ji zimanê xwe fedî kir. Di van salên dawî de zimanê kurdî hêdî hêdî bi pêş dikeve. Li gorî salên borî, gelê kurd êdî gelek hişyar bû. Dîsa jî, li gorî têkoşinê, pêşketinên di warê zimannasî û zimanzanîyê de hewcedariyên civakê naşin. Mirovên Kurdistanê, di bin mêtinkariyê de pir belav bûne. Mirovên me di bin-bîra xwe de hê jî tirkperwer û serdestxwaz in; ez îdida dikim ku mirovên me hin girîngiya zimên fêm nekirine. Mirovên me yên ku bi awayekî tûj welatparêziyê û şoreşgeriyê dikin, lê bi zarokên xwe re bi tirkî dipeyivin. Di bin-bîra mirovên me de axaftina bi tirkî sembola bajarîbûyîne ye, bi kurdî axaftin jî sembola gundîbûnê ye.

Hevalno divê em bi hemû heza xwe li ser girîngiya zimên bisekinin. Bi ya min, mirovên ku bi kurdî nepeyivin, hêj kesayetiyeke şoreşger û azad pêk neanîne. Van mirovan, hêj bandora axaftî û serdestiyê di hundirê xwe de nekuştine. Hê jî bindestiyê xelas nebûne.

Ez hin mirovên me yên ku li Ewrûpayê dijîn nas dikim. Mirovên gelek 'tûj' in. Welatparêz û şoreşgerên wekî agir in, lê ew mirov bi zarokên xwe re bi tirkî diaxivin. Gelo li Ewrûpayê jî dibistanên tirk hene?

Hevalno ez bi qasî 12 salan qet bi kurdî nepeyivîm. Paşê "mizgîna azadiyê û rizgariyê" gihîştê min û min dest bi zimanê kurdî kir.

RÊNAS DILOVAN/ ELBÎSTAN



Di bûyerên dîrokî de girîngiya serokatîyê

SAMÎ TAN

Gelek bîr û bawerî di destê rêxistinê de dikarin bibin navgîneke ku gelekî rakin ser piyan. Lê ew bîr û bawerî di destê rêxistineke din de, li cihêkî din bi kêrî tiştekî nayên. Her wiha dibe ku heman bîrdoz di destê heman rêxistinê de, lê di dem û cihêkî cuda de nikarin heman bandorê li gel bikin.

Li vir tiştek tê bîra mirov, tevgera şoreşger a ku Fidel û Che serkêşî dikirin li Kubayê bi ser ket, lê dema Che li Bolîvayê bi heman armancê bi rê ket bi ser neket, giyana xwe di rîya şoreşê de da. Tecrûbeyê Che ji berê zêdetir bû, lê tecrûbeyê hêzên li dijî şoreşê jî zêdetir bûbû, lewre jî ew tevger bi ser neket. Divê neyê jîbîrkirin ku pîrî caran hêzên kedxwar ji tevgerên azadîxwaz zêdetir ji tecrûbe û ezmûnên hev sûtê werdigerin.

Li ser vê mijarê gotîneke Nazim Hikmet a li ser şoreşa Okteber tê bîra mirov. Hikmet jî devê Lenîn van gotinan vediguhêze: "Duh zû bû/ Sibe wê bibe dereng/ Roj ev roj e." Merc û şertên şoreşê tim li gorî dilê mirov pêk nayên û li hêviya mirov jî namînin. Te dît hew pêla şoreşê hat

û heke tu nikarî bi ser bikevî ev pêl vedikişê. Êdî heta ji te tê bike girî û hawar, bi kêrî tiştekî nayê.

Divê ev gotin çewt neyê fêmkirin, lewre ev gotin nayên wê wateyê ku bandora mirov li ser van şert û mercan çêna-be. Yan jî piştî ku mirov di demê de bi ser neket, divê mirov rûnê li benda pêleke din bimîne. Heta ger mirov bi ser bikeve jî, dema mirov bersiva demê nede, tiştekî bi dest naxe.

Di van gavên dîrokî de pêşbîniya rêxistinê û serokên rêxistinê gelekî girîng e, lewre diwê ew gavên pêwist di cih û demê de biavêjin û bidin avêtin. Bi taybetî li welatekî ku lê mercên awarte yên civakî hene û ew merc li ber pêkhatina hinêk tiştan dibin asteng, girîngiya îradeya tevgerê û serokê wê tevgerê derdikeve pêş.

Dema qala şoreşa Sovyetê dibe Lenîn, dema qala raperîna Kubayê dibe Castro û Che û gava qala berxwedana gelê Vîetnamê dibe Apê Ho tê bîra mirov. Her wiha dema qala 15'ê gelawêjê bibe jî bêguman navê Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah

Öcalan tê bîra mirov. Ev tiştekî surîştî ye. Bêyî hewl û tevgera wî ew gav tu car nedihat avêtin. Dîsa, heke pêşbîniya wî ne-bûya, ev nav di wextê de nedihat avêtin, belkî jî wekî hewleke nîvcoyî an jî xeyalekê bima. Kesên ku serokatîyê dikin, bala xwe didin rewşê, tê derdixin ku roja gav-avêtinê hatiye.

Bi rastî ji bo ku yek karibe vê gavê bi-avêje, wêrekiyeke mezin pêwist e. Lewre dema ew gav di cih de neyê avêtin, gelek tişt ji dest diçin, qulpên ku bi dest xistine ji dest rêxistinê diçin. Piştî vê têkçûnê avêtina gaveke nû gelekî dijwar e. Her têkçûn di bîr û giyana mirovan de birînbûnê kûr vedikin. Mirovên şikestî angû ketî, ji aliyê derûnî ve mirovên nexweş in. Ji wan, afirandina mirovên serbilind û azad gelekî dijwar e. Ji bo vê yekê jî îradeyeke gelekî xurt divê. Tevgera ku di 15'ê gelawêjê de gav avêt, bi taybetî jî serokê wê tevgerê xwediyê vê vîn û îradeyê ye. Ji ber vê yekê tevgera ku bi dehan kesî dest pê kir, bû tevgera milyonan. Vê bûyerê û xwediyê wê gava dîrokî di mêjûya Kurdistanê de navê xwe bi tîpên zêrîn daye neqîşandin.

Kesê ku bi çavekî zanyarî li dîrokê binêre, wê nikaribe vê rastiyê paşçav bike, kesê ku wê rastiyê nebîne jî tu car nikare navê zanyariyê li xwe bike. Ji bo ku yek wê rastiyê destnîşan bike, hewce nake ku ew PKK'yî an jî, kurd be.

Egera 15'ê gelawêjê çi bû?

O. NURİ AMİL – EKREM YÜRÜK

Di 14-15'ê gelawêja sala 1984'an de bi êrişa HRK'ê ya ser Dihê û Şemzînan hilpişkîna rizgariya Kurdistanê dest pê kir. Li hemberî wê bûyerê pir kes şaş û heyirî man. Hinekên jê fêm kir, lê piraniya mirovan jî wê hilpişkîna fêm nekir û li gorî xwe şîrove kirin.

Di vir de, divê tiştek baş were zanîn ku, ûşt (eger) wê çi bû? Çiqas mezin bû? Belê, dema em li dîrokê dinêrin, pir şoreş û bûyer û lebatên giranbûna, hene ku civakên bindest pêk anîne. Bêguman di pêkanîna her hilpişkîna de, ûşt wan jî girîng e. Li Kurdistanê jî tê zanîn ku bi hezar salan e dagirkerî heye û wê dagirkeriyê nehiştîye ku kurd di wê pêvajoyê de wekî neteweyekê jiyana xwe bidomînin. Bi halê ku kurd neteweyekê herî kevnar e. Em li vir bi dîr û dirêj li ser dîroka Kurdistanê nasekinin, lê ji bo ku ev pêdiviya hilpişkîna 15'ê gelawêjê were fêmkirin, gerek bê zanîn ku kedxwaran (bi taybetî Komara Tirk) mirovên kurd kirine çi rewşê.

Dema em li cihanê mezê dikin, pir dewletên kedxwar hene. Lê tu caran di aliyê zilmê da negihîştine dewleta tirk. Dewleta tirk, li Kurdistanê çi kiriye? Berî ewil dagir kiriye, ev dagirî bi xwîne

pêk aniye û di kesayetiya mirovan de ruhê koletiyê çikandiye, mirovên kurd jî hemû nixrên wan ê neteweyî dîr xistiye, mirovî û civakî ji dest standiye, ziman, çand û huner qedexa kiriye, li dewse zimane xwe bi cih kiriye. Ji gel re tu mafê jiyane nehiştîye, her roj û gavên wan bi kotekî û lêdanê derbas bûye.

Welatê kurd, gundê kurd, li kurd kiriyê doje. Kedxwarên tirk di van kiriyarên xwe yên qirêj de tu cudatî nekirine

Hilpişkîna-15'ê gelawêjê roleke dîrokî listiye û pêşiya tunebûn û qirkirina mirovahiyê girtiye; çawa ku li hemû Kurdistanê deng daye, her bi vî awayî ji bo kedxwarên tirk jî, bûye xof û tirseke mezin.

navbera kal, jin û zarokan; dest avêtine jinan, zarokên dergûşê kuştine, kalê heftê salî darvekirine. Di vir de mîna keke balkêş ku di Serhildana Dêrsimê de pêk hatiye rewşa hanê baş diyar dike. Piştî ku serhildan tîk diçe, dewleta tirk Seyîd Rîza û kurê wî digirin. Dikin ku wan darvekin. Lê li gorî zagonên wan Seyîd Rîza mezin e, kurê wî jî biçûk e. Lê

dewleta tirk hema wê şevê salê bav biçûk û yê kur jî mezin dikin û wan darve dikin. Ev mînak tenê bi serê xwe nîşan dide ku çi anîne serê kurdan û dîsa ev sedem û pêdiviya herî mezin e ji bona şerê rizgariyê.

Belê, li hemberî wê ketinê, wê tunekirinê û wê qirkirina mirovahiyê pêwistî bi lebateke mezin hebû. Tevgera 15'ê gelawêjê di vir de roleke dîrokî û pêşiya (rê) tunebûn û qirkirina mirovahiyê girtiye. Ji ber vê yekê hilpişkîna 15'ê gelawêjê li hemû Kurdistanê çawa ku deng daye, her bi vî awayî ji bo kedxwarên tirk jî, bûye xof û tirseke mezin. Lewra desthilatiya wan bi wê hate hejandin. Beriya hilpişkîna tu statûyeke kurd û Kurdistanê li cihanê tunebû. Lê dema îro em mêze dikin, kurd û kêşeya wan li her derê pîrseke girîng e û di rojevê de ye. Tu rûmet ji kurdan re tunebû. Lê em dinêrin, kurd hem li cem dijminê xwe bûne giranbûna û hem jî bûne xwedî gelek dostan, ku ev dostanî cara yekemîn bi dewletan re hatiye danîn. Vê hilpişkîna kurd jî nû ve afirandin.

Ev mirovê xwedî kesayetiya serbixwe û azad, ku bi wê lebatê pêk hatiye, ewê di dawiyê de serkeftinê bîne. Lewre ev kesayetiya kefî û raketî, bi 15'ê gelawêjê hişyar bû û ji halê mirinê derbasî jîndarî û berxwedana xwe bûye.



KOMEK ji endamên "Meclîsa Nûneran a Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê" amadekariyan dike ku ji bo berdana Parlementera Kurd Leyla Zana serî li Bill Clinton bide. Di serî de parlementerên Partiya Komerger John Porter û Frank Wolf û ji Partiya Demokratîk Elizabeth Furse û Esteban Torres tevî sed endamên Kongreya Amerîkayê, di nameya xwe de, ji Bill Clinton dixwazin ku ew rewşa Leyla Zana di demeke zûtirîn de ragihîne rayedarên tirk da ku wê bê şert û şîrûd berdin. Nameya ku di bin pêşengiya AKIN (Tora Agahiyê ya Kurdên Amerîkayê) de hatiye amadekirin, wekî parçeyek ji kampanyaya ji bo berdana Leyla Zana tê binavkirin.



HEYETEK ji HADEP'a Mêrdînê, ji bo ku tevkujiya cerdevanan ku hefteya borî qewimî bû di cih de bikole çû navçeya Dêrikê. Heyet rêberiya Sekreterê HADEP'a Mêrdînê Cemal Veske de civiya. Roja 5'ê Gelawêjê çû gundê Siyametê (Akça). Heyetê bi Reşit Vuralê ku di bûyerê de kurê wî Siddîk û biraziyê wî Ercan Vural hatibûn kuştin re, hevdîtinek pêk anî. Her wiha Vural daxuyand ku ev bûyer ji hêla binbaşî Yılmaz Peker ve hatiye organizekirin û ewê der heqê wî de dozê vekin. Li ser vê bûyerê Sekreterê HADEP'a Mêrdînê Cemal Veske da zanîn ku sistema cerdevantîyê ji van hoviyan berpirs e û divê ev sistem bê rakirin.

NÛÇE

Stêra 15'ê gelawêjê geştir dibe

Tevgera ku di 15'ê gelawêja 1984'an de bi çend kesan dest pê kir, li seranserê cîhanê deng ve dide. Di raporên dewletên împeryalîst de PKK wekî rêxistina herî mezin û bi xetere tê binavkirin. Li aliyê din şerê qirêjî sîstema dewleta tirk bi temamî xitimandiye. Dewlet bi temamî ketiye bin destê çeteyan.



Mirov dikare bi hêsani têkoşîna neteweyî ya Kurdistanê wekî têkoşîna herî mafdar a cîhanê bi nav bike. Wekî ku Mamosta İsmail Beşikçi jî aniye zimên neteweya kurd ne xwediyê mafên welatekî mêtîngê e jî. Li welatekî bi vî rengî têkoşîna azadî û rizgariyê pîroztiyê kar û xebat e. Lê, li aliyekî din bi salan li Kurdistanê derfet û mercên ji bo têkoşîneke neteweyî miçiqî bûn. Têkoşîna herî mafdar a cîhanê di heman katê de têkoşîna herî dijwar a cîhanê bû. Ji bo kesên ku qala têkoşîna dikirin, digotin: "Hûn li avê dikolin."

Digel vê yekê jî di salên 1990'î de têkoşîna ku bi sed kesî dest pê kir, bû serhildana milyonan. Li hemberî vê yekê Serkaniya Giştî di sala 1993'yan de şerêkî giştî li hemberî tevgera kurdan da destpêkirin. Di vî şerî de bi hezaran kesên sivil hatin kuştin, 4 hezar gund hatin valakirin. Niha hemû zanyarên wan jî didin zanîn ku vî şerî di warê siyasî, aborî û civakî de sîstem xitimandiye. Dewlet bi temamî ketiye bin kontrola çeteyan. Endamên çeteyan şerê qirêjî ji sîcên xwe re dikin mertal. Gelê ku ji gundan koçî keviya bajaran bûne, li gorî sazîyên dewletê li ber teqînê ne. Li gorî Wezîrê Dewletê yê ji GAP'ê berpirs Salîh Yıldırım, % 81'ê koçberan bêkar in, % 35'ê wan jî bi birçibûnê re rû bi rû ne. Lê dîsa jî HA-DEP li Kurdistanê partiya herî mezin e. Kurd dev ji doza xwe bernadin.

Her wiha dewleta ku dixwest gerîla di Botanê de bifetisîne, niha dibîne ku gerîla heta Ordu, Tokat, Giresun, Gümüşhane-yê hatine. Li başûrê Tirkîyê jî heta

Edeneyê hatine. Li bajaran jî çalakiyên xwefedayî rayedarên tirk dixwe nava tirsê mezînin.

Îro kêşeya Kurdistanê di rojê cîhanê de di rêza yekemîn de cih digire. Li seranserê cîhanê dost û hevalbendên kurdan hene. Li aliyê din her kes tê gihîştîye ku divê ev kêşe bi riya siyasî çareser bibe.

Bi taybetî piştî damezirandina Parlemantoya Kurdistanê ya li Derveyî Welêt (PKDW) di warê diplomatîk de destkeftinên girîng û heja pêk hatin. Ev rastî êdî ji aliyê berdevkên herî bawerhişt ên îdeolojiya fermî ve tê pejirandin. Yek ji van berdevkan, balyozê berê yê tirk Şükrü Elekdağ e. Wî roja 4'ê gelawêjê di quncikê xwe de qala vê yekê kir. Li gorî ragihandina Elekdağ li Washingtonê bi navê "Diwaroja Tirkîyeyê" (2 roj) kombûnek li dar ketiye. Di vê kombûnê de ji Brîtanîya, Tirkîyê û DYA zanyar û rojnamergerên zana û navdar cih girtine. Li ragihandina Elekdağ nivîskarekî îngilîz ku der barê Tirkîyeyê de şareza ye, gotiye ku kêşeya Kurdistanê her diçe xeternaktir dibe û divê ev kêşe bi şeweyekî siyasî bê çareser kirin. Lê, Tirkîyeyê vê yekê nabîne. Dîsa li gorî şîroveya rojnamegerê îngilîz, Tirkîyê hew dikare bi hevkarîya Îran, Iraq û Sûriyeyê kêşeya Kurdistanê çareser bike. Nivîskar wekî çareserîyeke din jî pêşniyaza Mustafa Kemal a di serdema şerê neteweyî de dide.

Şükrü Elekdağ di nivîsa xwe de rexneyan li Balyozê DYA'yî digire, ji ber ku wan xwestine di dema herî zû de kêşeya Kurdistanê binin rojevê û li ser vê mijarê pirs li wî barandine. Li gorî ragihandina Elekdağ dostên wî yê ji Wezaretê Karên Derveyî yê DYA û yê ji Pentagonê li ser kêşeya Kurdistanê heman tişt gotine. Li gorî şarezayên DYA'yî bi perçiqandina PKK'ê kêşeya Kurdistanê nayê çareser kirin. Berevajî vê yekê, kêşeya Kurdistanê her diçe xedartir û dijwartir dibe. Dîsa heman şareza radigihînin ku PKK di warê birêxistinbûna navneteweyî de gelekî bi ser ketiye. PKK ji ber ku li dijî artêşa tirk têknaçe û li ber xwe dide, gel bi çavekî pîroz li PKK'ê dinere. Tiştê balkêş ew e ku Elekdağ digel ku van nixandinan rastbîn dibîne jî kêşeya Kurdistanê bi rewşa aborî û civakî ya Kurdistanê girê dide.

Yekitiya neteweyî xurt dibe

Damezrandina PKDW'ê û vebûna MED-TV jî ji gelên Kurdistanê destkeftinek heja û girîng e. MED-TV bi taybetî sînorên psikolojîk ên di navbera her çar parçeyên Kurdistanê de pelîşandin û ji bo yekitiya neteweyî rolekî girîng bi cih anî. Ji ber vê giringiyê dewleta tirk bi hemû hêza xwe têkoşîya ku MED-TV'yê ji navê rake.

Her wiha bi têkoşîna Partiya Karke-

rên Kurdistanê bakur û başûrê Kurdistanê bû yek. Ev di dîroka Kurdistanê de di nav rûdanên herî girîng de cih digire. Ev yek bi taybetî piştî operasyona dawî a artêşa tirk pêk hat. Piştî vê operasyonê generalên tirk yekemîn car li xwe mikur hatin û gotin ku firokên wan bi fûzeyên SA7-B jî aliyê PKK'ê ve hatine xistin. Dîsa Partiya Karkerên Kurdistanê bi taybetî li Rojhilata Navîn hevalbendeke bingehîn tê jimartin. Li cîhanê jî welatên ku berê têkilî kêşeya Kurdistanê nedibûn êdî dixwazin di vî warî de bibin xwedî gotin. Wekî minak Îtalya her diçe jî nêzik ve rûdanên li ser kurdan dişopîne. Wekî tê zanîn li Romayê der barê kêşeya Kurdistanê de konferanseke navneteweyî li dar ket. Her wiha welatên wekî Meksîkayê yê ku gelekî dûrî Kurdistanê ne di parlamentoya xwe de ji bo kurdan biryara piştgiriye standin.

Wekî encam mirov dikare bibêje stêrka 15'ê gelawêjê her diçe geştir dibe û gelên Kurdistanê ber bi dewletbûnê ve diçin. Lê, divê bê zanîn ku rojên xedartir û dijwartir li benda gelê kurd in. Ji ber ku jiyandina şoreşê ji pêkanîna şoreşê dijwartir e. Yek jî divê kurd qîma xwe bi çareseriyên erzan neynin. Rewşa filistinê jî bo kurdan mîna keke baş e.


NAVENDA NÛÇEYAN

Gera herî "xweş"

Çend roj berê tevî gelek mamosteyên din, rîya me bi Heskîfê ket. Wekî tê zanîn, Heskîf (Hesenkêf) navçeyek e di navbera Êlihê û Kerceswê de û cihekî şêrîn e. Li qêraxa Dicle ava bûye. Ev navçeya biçûk li ser du girên li hemberî hev, berî niha bi hezar salan ava bûye. Di nava van giran de, Dicle bi hemû xişmeta xwe diherike. Bê deng û bi

Zimanê me, çanda me, şahî û govendên me qedexe ne. Ji bo bendaveke ku karibin jê elektrîka 50 salî hilberînin, vî bajarê dîrokî ku hempayên wî li dinê pir kêr in, winda bikin û di bin avê de bihêlin. Ji vê hovîtiyê mezintir hovîti heye gelo?

Tiştêkî pir ecêb; malek di şikeftê de û malbat jiyana xwe li vir didomînin. Di hêlekanê de zarokêk di xewa şêrîn de bû. Hevalê min xwest ku wênayê wî bikişîne, lê keçika li ber malê destûr neda. Em bêhnêkê bi zarokên



melûlî, li hemberî vî bajarê dîrokî ber bi Bakur ve deşta Êlihê (Batman) bi wê axa xwe yî bi xêr û ber dirêj dibe. Avahiyên bajêr yêr kevn tevde şikeft in. Ew şikeftên bi şewk û bîviran bi keda piyan û roniya çavan hatine çêkirin. Ew dîmen mirov dibin bîreweriyên hezar salane û digerin. Çi heyf e ku mirov dawiyê bi dilêşekê ji vê xewnê hişyar dibe. Ji ber ku ev dîroka vî bajarê kevnare ku bi hezar salan hatiye afirandin, îro dixwazin di bin gola bendavê de winda bikin.

vê malê re peyivîn û dû re em meşyan.

Carekê hevalê min di cih de matmayî sekinî, got: "Hela tu lê binihêre." Min lê nihêrî, tiştê ku min dît ez jî matmayî hiştim. Ji serê gir hetanî binê gir, di vê tahtê ku wekî mirov bi kêrê bibirî, rê çêkiribûn. Me pirsî, yekî got: "Ji jor de di pêpelikên vê riyê de dadikevin jêr û ji xwe re avê dibin."

Mizgefta ku li serê gir ava bûbû hê baş xera nebûbû, ew jî hêjayî temaşeyê bû. Ji aliyekî bi kêfxweşiyê, ji aliyekî jî bi dilxemiyê me gera xwe

Em hêdî hêdî di rîya keleha vî bajarî re hildikişyan. Em di deriyê bajêr re derketin. Çayxaneyek derket pêşiya me. Em di vê hênika hiya serê sibehê de, li devê deriyê vê çayxaneyê ku di hundirê şikeftan de çêbûbû rûniştin. Bi tejk, mers û xalîçeyan ev şikeft (çayxane) hatibû raxistin. Ev xalîçê û mersîk jî li Heskîfê hatibûn çêkirin. Ji aliyekî jî dengê kewan bi qebeqeb dihat me. Me got: "Qey kew li her deverê heye." Belê kew li vê derê jî hebûn.

Piştî vê bêhnvedanê em derketin serê gir. Dîtin û gotin nabe yek. Ji serê gir de me xwe bi ser Dicleyê de xwar kir. Wê demê em gêj bûn û bi paş de vekişyan.

Li deverên din em bêhnêkê geriyan. Min dît ku hevalê min bi wênêkêsa xwe tiştêkî dikişîne. Ez çî bibînim.



qedand.

Bi rê de hevalekî min î tirk bi xemgînî jî min re got: "Ev barbariyeke pir mezin e ku wê vê dîrokê ji holê rakin. Ev çawa hovîti ye?"

Rast e.. Îro dijmin bi hovîtiyeke mezin şerê qirêj didomîne. Di vî şerî de hemû hebûnên ser-erd û bin-erd ên

vî welatî ser û bin dîkin. Bi xwînri-jandinê naçin ser, îcar agir bi gund û malan dixin û dixwazin tiştên dîrokî jî winda bikin. Avî, zevî û daristanên vî welatî giş ji vê hovîtiyê para xwe distînin. Avahiyên dîrokî jî ji vê hovîtiyê bêpar namînin. Ji ber ku netewe wekî darekê ye. Dar çawa bi rehên xwe ji binê axê, tiştên ku ji bo jiyane pêwîst e dimije, neteweyek jî, ji dîroka xwe, ji çanda xwe, ji zimanê xwe, ji xwezaya xwe hêzê distîne û dibe netewe.

Îro hemû hêjahiyên me di bin pêkûti û talanê de ne.

Zimanê me, çanda me, şahî û govendên me qedexe ne. Ji bo bendaveke ku karibin jê elektrîka 50 salî hilberînin, vî bajarê dîrokî ku hempayên wî li dinê pir kêr in, winda bikin û di bin avê de bihêlin. Ji vê hovîtiyê mezintir hovîti heye gelo?

Ciwamêrekî ji me re gotibû heta hûn xwarinên vê deverê tahm nekin nerin. Me ew daxwaza wî jî bi cih anî û em bi ser rê ketin. Lê dilê me û hişê me li wê deverê ma.

Kîna Dîrokî

Bi mirovan re kîna dîrokî çêdibe. Mirov li hemberî pêpeskirina maf, serbestî, azadiya, li hemberî zilm û zorî, zerar gihandina mal û can kîn digire. Ev kîn ta mirinê yan jî, ji bav û kalan derbasî zarok û neviyan dibe. Ango ji mirovan gelek car tê bihîstin: Kula wî dê bi min re here mirinê. Ev dide xuyan ku wî kesî tola ji yê din nestandîye. Ev kîn û kul di dilên zarok û neviyên wan de jî tê bicihkirin, dibin êş û elem û dem tê diqedin. Tola xwe distînin.

Di dîroka mirovahî de, kîna gerdûnê ji bo tirkan û pêşiyên wan osmaniyan heye. Pêşiyên tirkan osmanî texrîbat û birînên kûr di dilên gelan de vekirine, ew jî bûye sedema kîna dîrokî, bi çavekî dijminatî li tirkan dimêzin. Ji ber ku tirk jî, kevneşopa kalên xwe diajan; gel der barê kînbirina xwe de mafdar in.

Dema mirov li Balkan dibêje: Ez ji Tirkîyeyê me, bersiva wan ev e: Piçê osmaniyan. Ma ku osmanî-tirk bi zorê di welatên wan de bi cih nebûna û jinên wan bi kotekî û zorê li xwe mar nekirana, şûr neda stûyên wan, bi zorê ew nekirina tirk, dê çima û ji bo çi kîna dîrokî di dilê wan de ji bo tirkan çêbûya?!

Dema ku artêşa osmaniyan dikeve

Neviyên kurdan jî dê sibê kîna wan a dîrokî ji neviyên tirkan re hebe. Helbet ev ne daxwaza me ye ku tiştêkî wiha di navbera du gelan de çêbe, bes rejîma tirka faşîst vê jehrê di xwîna gelê ku di bin destê wî de ye bi cih dike.

Bûlgaristanê, wira tarûmar dike, şûran datînin ser stûyên bulgaran dibêjin: "Yan hûn dê bibin tirk an jî, em dê we bikujin!" Ên ku ji tirsan xwestine bibin tirk ji bo ku şûr serê wan nebire, serên xwe rast û çep bi wateya 'erê' hejandin. Yên ku nexwestine bibin tirk jî, serên xwe berjêrkî bi wateya 'na' li şûrê osmaniyan xistine, wan bi xwe serên xwe birine, tirkîfî nepejirandine.

Ev jestên han, niha di kultura bulgaran de hatiye rûniştandin û rojane têne bikaranîn. Hê jî bulgar serê xwe bi wateya 'erê' rast û çep dihejinin, bi wateya 'na' jî, serên xwe berjêrkî hevraz û berjêr dihejinin. Ev jest li gor kulturên gelên din çep in, 'na' di şûna 'erê' de û 'erê' di şûna 'na' de dixebitînin. Dema ji wan tê pirsîn: Hûn çima wisa jistan çewt dibersivînin?! Li gor kulturên di berevajî ne! Bersiv, wekî me li jor rave kir, didin.

Belê, ev kîn bes bi Balkan ne bi sî-

nor e; derbasî Ewropa û Asyayê jî di-be. Em çend mînakan bidin. Li Romanya ji mirovên zorba û zordest re dibêjin: Tu est tirk? El est tirk! (ma tu tirk î? Ew tirk e!), rûs ji tirkan re dibêjin: "Kasmîr (xwenenas)", ermen: "Kanîbal (mirovxwer)", fransiz: "Tok e baba nemîfamê! (tirk e bavo fam nake)" Ango wî mirovahî derdixe. Tirkên Kibris "Karagoz", veyvê di wateya 'bela û talankar' de bikar tînin. Jixwe Kibrisî wiha dibêjin: "Di cenga 74'an a Kibrisê de, Tirkiya pêşî hat li me xist û malên me talan kirin, ne ku hatin em rizgar kirin!"

Ev kîna dîrokî ji can û mal, zilm û zordestî, dagirkirin û talankirin û bi sedsalan berdeqam dike. Heger em parîkî bi dîalektîzmê bifikirin, dê kîna dîrokî ya kurdan derbasî zarok û neviyên wan bibe?! Li gorî xweza mirov û dîalektîkê divêt ku çêbe. Ango hinek dikarin bibêjin: Feodalîfî û kevneperîfî tê fikirin!, yan jî bêjin: Ji ber ku em ge-

lekî paşverû ne mîmkun e, lê em li milêtên zerarkar, zordest û dijminên madî, manewî hene û ji bav û kalan şîret dewrî neviyên xwe kirine. Mînak, ev çend sal in ku di ser cenga Hitler re derbas bûye jî, rûs hê jî, ji almanan aciz in. Dema pasporta almanî dibînin, peyva wan a pêşî çêr e. Em nikarin bêjin ku ev jî îdeolojiyê tê! Jixwe niha Rusya ne komunist e, ji ewrûpiyên din hez dikin.

Neviyên kurdan jî dê sibê kîna wan a dîrokî ji neviyên tirkan re hebe. Helbet ev ne daxwaza me ye ku tiştêkî wiha di navbera du gelan de çêbe, bes rejîma tirka faşîst vê jehrê di xwîna gelê ku di bin destê wî de ye bi cih dike. Mêze bikin, ji bo ku Tirkîyeyê zerar daye cînarên xwe, yek ji wan jê hez nake û ev kîn bi îxanetê ve jî tîkîlîdar e.

Ziyandayî û îxanet ji bo jiyana netewekê bi xeter e. Kurdan tu carî îxaneta navxwe nebexşandine. Îxaneta PDK'ê jî dîrokî ye û dê di dilê kurdan de bibe kîna dîrokî, bibe birîna reş. Piştî sed sal ên din jî, dê kurd bi çavekî ne baş li Barzaniyan û neviyên Barzaniyan binêrin û ev li ba her gelî wiha ye; leheng, îxanetkar û cahşên wan navên xwe di dîrokê dinivîsin. Îxanet navê bexşandin!

S.S DILPOLO

Sî û bajar

FAYSAL DAĞLI



Tirêjên teboxê, bi qasî ku ji laşên mirov çavkaniya jiyane bidizin, tûj in. Sî, wekî ku ji tiştên dişopîne ketiye û wek sîlûleteke betilî wê dişopîne. Goga agir, wekî xezeb li ser asîmanê bajêr rûdine û heta ku hukmê xwe wînda bibe, bajêr ziwa dike. Tebox jî dûr ve wekî pêlên germ direqise. Amed wekî ku bikele. Dîjle di taldên çeperên xwe de li dijî agirê dizî, li ber xwe dide. Ji aliyekî ve jî, helm pê ketiye. Wê li asîman bicive û bibe feyza biharê. Çem, ji aliyê din ve dilezîne, ku bigihêje bihuştê xwe ya windayî. Daristanên Ewsel dixwazin şînahiya xwe biparêzin. Ger tav Ewselê ziwa bike, wê bajar jî bêhna xwe wînda bike.

Diyarbakir niha betilandî ye. Xortên bajêr çermên xwe ye ku dişewite, di hewza Dingilawa ku Kupelî de û tefînin. Zarokên bajêr niha bi memûrtiya ku li çavên wan ê granîf diherike, li dijî nexweşiya li ber xwe didin. Birçiyê bajêr, rojêke din jî bi şerefa xwe derbas dikin. Hepsiyên bajêr li bin pacên Rojhilatê ku li Qerejdaxê di nihêrin, li bin ranzayên xwe rûniştine û rojêke din jî bi nûkirina hestên berxwedan û ronakbûnê derbas dikin.

Her yek xeyal dike, ku wê rojêke di bin erdê da biherike bigihêje çiyayan û bilindî rojê bibe. Jinên Amedê ku çavên wan wekî dîwarê sûrê reşin, bûxa wan çavan dikele niha. Huznên wan rojê digire, eşq û kesera wan artêşan dişewitîne. Mêrên bajêr niha xwe avêtine taldeya giran a sûrê. Sûrê xwe sipartiyê dîrokê. Dîrokê xwe nekişandîye pirtûkan. Pirtûk ji bo ku ji nû ve bê nivîsandin, bar kirine çiyayan. Roj niha ronî dike li çiyayên Amedê. Ronî bînahiyê dide çavan.

Û gerîlayên Amed, niha bi bîhnên xwe yê qasî agir gur, ji Andoka ku alew derbas nake û ji şên a ku nêzî goga agir e, alavên bajêr geş dikin. Bi şoreşên xwe yê jah vedireşe, di kemînan de ne ku xeletiyên sererast, kirêtiyan xweşik û derewan rast bikin. Niha, niha di vê demê de, vê dema ku çavên we li ser van rêzan ligere, wan şowalyeyên bi heyecan, li daristana Bedikan, an jî Serê Spî ya Paşûrê, bîhna xwe girtine û wê qasekî din nikaribin, ber li aleva di lûleya xwe de bigirin.

Û dijminê bajêr jî hene. Ew, jiyana xwe di destê xwe de digerrînin û piştî ku wan şerefa xwe li meydana bajêr wînda kir, careke din nedîtin. Niha ew ji bo hêrsa axayên şer bitefînin, xwîna xwe di nav qedehên bi sirma de ji wan re pêşkêş dikin û li taxên bajêr carina yek bi yek, carina jî gelek tînan qurbankirin. Cesedên wan ê bêaheng, di nav tabûtên bepûte de, di hangareyên balafirana de di haziriya rewîngiyekê de ne ku berê wê ne diyar e.

Û windayiyên Diyarbakirê hene. windahiyên ku di teboxê de zêde dibin. Xeyaletên li çiyayên bi agir diherikin; şehîdên ku bi lîngên xwe ji çiyayan dimeşin û li ser milên rûniştvanên bajêr meşa xwe didomînin. Ê ku di teboxê de herî zêde dibin, zarokên ku xwe gorî bajêr dikin. Welatê Elîparê, Bayramê Xançepekê, Navdarê Baxlera, Elaatinê Melîkahmedê, Ezîzê Saraykapiyê û pêşengên wan. Mûsayê rûspî, Mihemedê nûçevan, Hafîz û Namîkê rojnamevan, Wedatê leheng û şehîdên bajêr, ku bedenên wan di agirê teboxê de heliyane. Sûltan a sûrê, prensesa agiran Zekiye û bi dehan, bi sedan... Û bav û kalikên wan, Şêxê Pîran, hostayê cesaretê Dr. Fûat û ê din, di bin siya Derçiyê de, berê wan û wesiyeta wan, ber bi çiyayan ve. Ku wan şîret û mîratên xwe deyn û barê xwe, şer û gotinê xwe yê dawîn ji bajêr re hiştibûn, niha di taldeya sûrê de li bajêr temaşe dikin.

Tav giran dibe li Amedê di teboxê de. Sî dikele, xwîn hildikşe û dîrok dibetile. Tav niha li ser zereyên jiyane hukum dike. Hukmê tavê tenê derbasî kulîlkên ser gorên şehîdên bajêr nabe, ku wan, xwe di bin axa bifeyz û hênîk de dirêj kirine. Tenê hukmê tîrêjên li van mêr/jinên ku kulîlkên welatê windayî, bi abî hayata xwe av didin, derbas nabe.

Amed niha di berxwedana teboxê de ye. Bajar niha bi siya xwe ya giran, di meşa pêşerojê de ye.

Embaz Ferhat Uzun, Fermandar Reşo

Embaz Ferhat şaristana Sewreg ra bi. La belê min o, sera 1989 de Îzmîr de silasna bi. O çax, a saristan de kê waya xo de mendê. Embaz weş ewnayê xo ra. Çinayê ci tim û tim pakin bi, erdîşa ci roj bi roj cikerdin bi, porê ci vernî ra rişya bi ancî şanekerdin ra kemî nêbiyê. Embaz Ferhat, fikranê xo de jî zaf pak û zaf pêser bi. Weşîna ey de, çiyê ke çewtino çinêbi. Ey û embaz Alî Îhsan Üçkardeşiya, Sêwreg de embazîn kerd bi. Coka jî înan pê rind silasnayê. Heveyê jî pê manayê. A ser Alî Îhsan Stanbol de bi.

Embaz Ferhatî Bursa de Zankeyê Uludağ de Fakûlta Muhendîsan qedîne bî. Bursa de polîsan çend finî o girotibi binçim û tahde dabi cî. La belê o, nêkewtê xemdê tahdeyo ke dijminî dabi ci. Nê çiyê sero embaz Ferhatî wina vatê: "Dijmin dijmin o, minetê tahdeyê dijminî jî çiniyo. Ek ma xo vîra kerê, mayê o wext jî merdimateya xo vinî bikerê. Ez vana, gerek ma tahdeyê dijminî ra zaf çî bimûsê, heyfê ci bigîrê û biresê rûmetê xo."

Rojê ez û embaz Ferhat, ma piya şî bîm Şirinyer, kê wendoxanê welatperweran. A roj ma şewê kê ê embazan de bîm meyman. Wija pañ-şes embazî estîbi. Wayirê keyî wendoxê Zankeyê 9 Eylulî bi. Ma şan ra heta şefaq ronîştî û rewşê siyasetê welatî sero qisey kerd. Embaz Ferhat zey wayirê keyî xeftiyayê. O şan ey kiştê ra şamî pewtê, çay girênayê û kiştê ra jî kuşat kerdê û qisey resnayê embazan. Embaz zaf xo serd bi û zaf enerjîk bi. Mabendê mi ey rê wina vat: "Embaz emşo ma meyman ê, veradî wa wayirê keyî bixeftiyê." Na qisa mi sero embaz Ferhatî mi rê wina vat: "Çiyê winî beno embaz, ma jî wayirê nê keyî yê. Şoreşkerî kotî de bê, wija kê înan o. Ewro mayê tîya, o wext no keye kê ma yo. Gerek ma heme çî de embazî bim. Qisey de jî, xeftiyayin de jî. Ek ma şoreşkeriya xo, qiseyana tepê o çax mayê veşî teng bimanê. Çimê ma kurdan verdi çiyê winayîni vinî nêbenê. Loma ma kemiyanê embazanê xo rew vînenê, la belê ma kemiyanê xo qe nêvînenê. Wexto ke weşîna ma û



qiseyê ma pê nêtepsê, keso jî rûmet nêdo ma. Wa çinayê ma, wa şiyişê ma, wa karê ma, wa qiseyê ma pê bimanê. Ewro şoreş ma newdin ra keno raya raşt û fermana weşîna maya newî dano. Fermana nê şoreşî, fermana mardimatiya newî ya."

Embaz Ferhatî wexto qisey kerdî, zey embazanê bînan, solixa min jî sist bîbi û fikranê mi arêdabi pê ser. Min vat bi qey, ez newdin ra ameya dinya. Qiseyî ci fek ra jew jew vejyayê. Vatenanê ey ra kesî di çî nêkerdê pê miyan. A bîn jî, ey wexto ke çiyê sero qisey kerdê weşîna ra mîsal dayê. Diyaletîk weş zanayê. Vatê: "Ewro şarê ma rê çîçî lazim o, gerek ma ey weş biyarê zîwan û weş bidê silasnayin. Zey rûmetî, zey azadî, zey xoserîn, ma vajê ke zey weşîna bi însanetey û zewbîna. Ek şarê ma nê çiyê ke, rûmet dano kesî bisilasnê, êyê nînan dijminî ra bi zora xo bigîrê. Wa şar dijminî rind bisilasno ke, ma welatê xo bireynê. Kam se vano, wa vajo, reyayin ma dest ro. Ek ma şarê xo ya bibê jew mayê

dijminî welatê xo ra rew biqewnê."

Ney lecî de ciwanê ma zaf şehîd kewtî, hewna jî iyê kewnê. ciwanî tenya nê, qeçî, pîrî, kokimî, cinî, dewijî, saristanijî, zanekarî, rojnamegerî jî şehîd kewnê. Dijmin, dewan û mêşan veşnanê; şaristanan danê gulana ver û mezelan kenê xirabî. Dijmin wazeno ke welatê ma de çiyê jî weş nêterno. Çiçî ke kewno ci vernî nano pa. Hindê sereyê darzîne jî camêrdîna ci de çiniyo. Winî aseno ke, bi no hala ya mayê înan biqedîne, yan jî iyê ma biqedîne. Zewbî jî rayê, nêaseno. La belê şarî ma rê jî, şarê înan rê jî na ray rayeka rind niya. Qoçgirî de, Amed de, Dêrsim de, Agirî de, ewro welatê ma hemin de jî jew babeta yenê şarê ma ser. Mayê çî wext na weşîna qilêrin (limîn) ra birayê, mayê çimhal înan rê vajê: "Bes o!"

Alî Îhsan û Ferhat, piya şaristana Sêwreg de gird biyê, piya wendî û piya biyê şoreşgerê reyayîne şarê ma. Pê peyd jî şehîd kewtî. La belê cayê înan jî

veng nêmend, her roj Alî Îhsanî û Ferhatî bî vêşî, zey înan lec kerdî û iyê lec kenê. Wa dijmin jî, dostî jî nê winî bizanê. Ez bawer kena ke, şarê ma ney rind zanê. Bahdo jî ez çend finî şiya Îzmîr, la belê mi Embaz Ferhat nêdî. Serê tepya ez pey hesyawa ke şiyê welat. Ek raşt yeno mi vîrî, sera 1993 de mabendê Dêrik û Wêranşar de jû dew de, Fermadarê gerîlayan Dr. Kemala piya jew lecî de şehîd kewt. Ney lecî de înan piya hire gerîla jî şehîd kewtî. Goreyê vatenan, mûhtarê a dew xayin biyo û cayê înan dayo arêşa bandorkaran.

Şoreşker, fermandar û zanekarê kurdan embaz Ferhat lecê reyayîni de şehîd kewt. La belê oyo zerya şarê xo de tim û tim weş bimano. Wa dijmin ney rind bizano ke, dîrok heta şarê bindestan de ray gena.

Aray jî, rayê şehîd Ferhatî ya, û raya qeçanê adirî ya.

ZÜLKÜF KIŞANAK



- **10.08.1920:** Peymana Sewrê hate îmzekirin. Di vê peymanê de qala Kurdîstaneke serbixwe dihat kirin.
- **11.08.1938:** Erişa sêyemîn a komara tirk li dijî tevgera Dêrsimê pêk hat.
- **13.08.1966:** Mao Zedung, li Çînê "Şoreşa Çandê" da dest-pêkirin.
- **13.08.1945:** Ho Shî Minh tevî hevalên xwe serhildana gîştî li dijî dagirkeran îlan kir.
- **13.08.1961:** Di navbera her du Almanyan de "Dîwara Berlînê" hate lêkirin.

- **14.08.1947:** Pakistanê, serxwebûna xwe îlan kir.
- **14.08.1956:** Bertholt Brecht çû ser dilovaniya xwe.
- **15.08.1984:** Gerîlayên Partiya Karkerên Kurdîstanê PKK'ê, li bakurê Kurdîstanê dest bi şerê çekdarî kir. Gerîlayên Hêzên Rizgariya Kurdîstanê HRK'ê avêtin ser Dihê (Eruh) û Şemzînanê (Şemdinlî). Ev bûyer wekî teqandina guleya yeqemîn derbasî dîroka Kurdîstanê bû.
- **16.08.1945:** Gelê Wîetnamê serî hilda.
- **16.08.1945:** Konseya Aştiyê ya dinyayê hate avakirin.

AWIR

Ji PEN a KURD bang li nivîskar û weşanvanên kurd


Delegasyona PEN a KURD xwe amede kiriya da ku der barê pîrş û pîrsgirêka çand û zimanê kurdî de û nêzîkbûna dewleta tirk li hemberî nivîskar û wêjevanên demokrat ên mirovahîperest pêşniyazêke pêşkêşî civata kongreyê PEN a Navnetewî bike.

PEN a KURD ji bo kongreya xwe ya giştî bangî nivîskarên kurd dike

Kongreya yekîtîya Nivîskaran ya Navneteweyî PEN, di navbera 5-11'ê gelawêjê de li Îngilîstanê li bajarê Edinburgê tê li dar xistin. PEN a KURD jî hatiye vexwendin bo di kongreya giştî de beşdar bibin û cihê xwe bigirin. Di vê kongreyê de Serokê PEN a KURD Haydar Işık û Cîgirê Serok Dr. Zerdest Haco ji cihe xwe digirin.

Delegasyona PEN a KURD xwe amede kiriya da ku der barê pîrş û pîrsgirêka çand û zimanê kurdî de û nêzîkbûna dewleta tirk li hemberî nivîskar û wêjevanên demokrat ên mirovahîperest pêşniyazêke pêşkêşî civata kongreyê bike. Li gorî pêşniyazê, qedexeyên li ser çand û zimanê kurdî çewisandina li ser zanyar İsmail Beşikçi, weşankar Ayşe Nur Zarakolu û Ünsal Öztürk wê li ser masetê bê danîn û daxwaza gengeşî û rawestandina li ser pîrsgirêkê bête kirin. Her wiha dê helwesta dewleta tirk a li hemberî ziman û çanda kurdî û mirovên aştxwaz ku dewleta tirk bi tomik û dijberiyên dijwar diçe ser wan, bête şermazarkirin.

Dîsa dê li ser rê û rêbiwarên çareseriyê bê rawestandî, da ku biryara giştî li ser mijarê bê sitandin. Li gorî ragihandinên PEN a KURD, raporên li ser nêrin û nêzîkbûna dewleta tirk a der barê weşanvan û nivîskaran de, ji bo şaxên saziyê yên berpîrsyar jî hatine şandin. Heta di-



Serokê PEN a KURD Haydar Işık

yarkirin ku ji bo ku ev rapor di civna giştî de berhembêz bibin û bibin biryaren kongreyê wê hewldaneke xurt bête meşandin. Ji bilî ragihandinên çapemeniya kurdî ev daxuyanî, ji çapemeniya cihanê re hatiye faks kirin. Bala wan li ser şerê dewleta tirk î têrqiye ku li Kurdîstanê tê meşandin hatiye kişandin.

Di domandina vî şerî de, tawanbariya dewletên mîna Almanya û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, bi giştî dewletên Ewropî ku piştgirî û arîkariya dewleta tirk bi firotina çekan û pîrhêlên din dikin, heye.

Ji bilî van, di ragihandina saziyê de, rûpelên reş di dîroka dewleta tirk de ku tevkujî û qirkirina pîr neteweyan bûye rûreşiya demsalê, mîna ermenî, rûm û asûriyan bi şîroveyek vekirî hatiye ayan kirin. Rayedarên PEN a KURD bal kişandina, komelkujî û qirkirina kurdan, di dawîya demsala bîstanda ku bi vî şerê qirêjî tê meşandin. PEN a KURD daxwaza dike ku komên demokrat li hemberî wê rewşa tîr gunehkarî û tewanbariya mirovaniyê û dijberiya komên xelkê rabîn û dengê xwe bilind bikin.

Rêvebiriya PEN a KURD bang li nivîskar û weşanvanên kurd dike ji bo ku ew bi giştî û girseyî cihê xwe di vê saziya pişeyî ya naveteweyî de bigirin û heza xwe bikin yek û di vê qonaxê de ku gelê kurd nêzîkî azadiyê bûye û ber bi rojên tîr ronahî gavên xwe diavêje, binbariya xwe ya dîrokî pêk bînin û bibin rêber û rêzanê pêşerojan.

ÇAVDÊRÎ

AMED TÎGRÎS



Êş û jana min a 40 salî

Ez bawer im sal 1958 bû. Ez li Licê, li Gazi îlkolê (dibistana seretayî ya Gazi) diçim sinifa duyemîn. Rojekê ez di ber dukana Wedoyê berber de derbas bûm û diçûm dibistanê. Wî gazî mir kir: "Were vir. Ha vê rojnameyê bide Mihemedê Xelîfe, bila bide Yilmazê lawê xwe. Lê bidî bide ku kes nebîne ha!" Mihemedê Xelîfe li dibistanê xedeme ye. Yilmaz mezin bû ez bawer im zewicandî bû jî. Xelkê ji Yilmaz re digot: "Ew kurtçî ye."

Ez dixwazim hinek bi henek behsa Wedo bikim. Hingê Wedat Erkaçmaz xort bû û dukana wî ya berberiyê li taxa Karahasan nêzîkî mizgeftê bû. Wedat neçûbû dibistanê, xwendin û nivîsandina wî jî tune bû. Lê, wî û Hafîz Mehdi rojname û pirtûk dikirin û bi me şagirtên (telebeyên) dibistanê didan xwendin. Em biçûk bûn, me hîn nikaribû baş bixwînin û dema me dixwedn jî fêm nedikir. Ji ber ku me hem baş bi tirkî nizanibû û hem jî naverok siyasî bû, me jê fêh nekir ka çi dibêje. Dema em li gotinan dilikumiyan û me nikaribû baş bixwînin, Wedat meqes digirt û bi ser me ve dihat: "Kurê kerê rast bixwîne an ez dê guhên te ji bîni ve jêbikim ha!" Guhên me digirt û dikişand. Bi rastî Wedat hinek tîredîn bû, me bawer dikir ku dê rojekê guhê me jê bike!

Carinan Tahsîn Erdoxan em ji destê Wedoyê tîredîn û bêbav rizgar dikirin. Tahsîn hem mezin bû û hem jî dibistana navîn (orta okulê) qedandibû. Dema ku Tahsîn ne li wir bûya, wê demê halê me halê helawçiyar bû û bi taybetî halê min. Ji ber ku di nav wan zarokên biçûk de yê ku dikaribû herî baş bixwîne yek jê ez bûm. Yê din kim-kim û inte-int dikirin û nikaribûn bixwînin. Wedo guhên wan dikişand û pîn li qorika wan dixwist û ji dukanê davêtin der. Caman Hafîz Mehdi lê hêrs dibû û digot: "Wedo li mektebliyan mexe lawo, ew devnîmciyên (şoreşgerên) me yê rojên pêş in...." Wedo guhdariya Mehdi jî nedikir. Baş tê bîra min çend sal pişt re Wedat û Mehdi bûn sermepatîzanê Çetin Altan. Wê demê Akşam Gazetesî hebû û Çetin Altan di quncika "Taş" de her roj nivîs dinivîsand. Wedat û Mehdi bi piranî ew bi me didan xwendin.

Neyse ez vejerim serî. Min ji Wedo rojnameyê girt û bi çend hevalê xwe re di rê de me çav lê gerand. Em di rûpela pêşîn de rastî helbestêke kurdî hatin. Ev nêzîkî 40 salî ye ku hîn jî her du rêzên wê yê pêşî ji bîra min naçin. Wiha dest pê dikir:

"Dicle, Firad, Dicle Firad

Hîşyar bibin xortên welat!"

Li dibistanê piştî dîtina çend dersan, bîhnedanê (tenefûsê) dest pêkir û em derketin bexçeyê dibistanê. Min rojnameya girt û dest bi xwendina helbestê kir. Zarok li derdora min kom bûn û gelek bawer nedikirin ku helbest bi kurdî ye. Min dixwest û her yekî digot ka ez bibînim, ka çawa ye. Min li nêzîkî xwe dengê mamosteyekî bihîst û wî bi deng got: "Ew çi ye, çi heye?" Zarok bi dûr ketin. Rojname di destê min de û ez bi serê xwe li navê mam. Min dît ku midûrê dibistanê Ahmet Odabaşı bi xwe ye. Destê xwe dirêjî rojnameyê kir û got: "Ka bide min, ew çi ye?" Rojnameyê ji min girt. Çend deqîqe lê mêze kir û bi guhê min girt, bemed a û bi wî awayî ez birim dibistanê, rasterast bir odaya mamosteyan. Herdû mamoste li wir rûniştibûn. Hîn jî guhê min di destê wî de bû û her ku diçû dişidand. Ji mamosteyan re got: "Ka li vir mişko binêrin, bejna wî, hîn nikare bixwîne dest bi bûlucûtiyê (cudakariyê) kiriye. Heta jê hat şirmaqek li min da. Serên tiliyên wî gehîştin çavê min. Çirûsk jî ber çavên min çûn. "Hewar bavoyek" ji mir çû ku hemû şagirt li der pê hesiyan. Bawer bikin îro jî dema ez behsa wê bûyerê dikim, ez êşa wê şirmaqa 40 sal berî di çav û laşê xwe de his dikim. Û ez dê heta roja mirinê jî bir nekim. Belê, midûr Ahmet Odabaşı kurd bû û jî Çermûgê bû. Ez di jiyana xwe de, bi dûr û dirêjî di zindanan de nemam, gelek caran hatim girtin, li min dan, bi min êşkence kirin, lê wek êş û jana tiliyên Ahmet Odabaşı li can û ruhê min tesîr nekirine û şopên xwe nehiştine. Heta ez bimirim jî, ez dê nikarim ji wê êş û jana tiliyên Ahmad Odabaşı ji bir bikim.

W Astsûbayê ku wijdanê min g



Ev wêne di sala 1992'yan de ku wehşeta leşkerên tirk li gundekî Cizîrê kirine, tîne ber çavan. Gelek leşkerên ku hovi-tiyên bi vî rengî pêk anîn an jî dîtî, xwe kuştin, an jî di nexweşxaneyan de têne tedawîkirin. Îro tiştêkî pir balkêş e gelek kesên ku leşkeriya tirk kirine, ji ber pest û pêkûtiyên li ser kesên kurd û ji ber wê wehşetê dest ji karê leşkeriyê berdidin.

Navê wî Mustafa K... ye. Bi eslê xwe kurd e, ji navçeya Misirca Sêrtê ye. Biçûkê heft birayan e. Ji ber hin sedeman piştî leşkeriya Komara Tirk dev ji leşkeriyê bernade û dibe Astsûbay. Lê heta wê demê jî, ew bi xwe dizane ku kurd e, lê tu tiştê wî jî ne li ba kurdîtiyê ye. Li leşkeriyê leqayî gelek pest û kotekiyên li ser axa kurdan dibe, mirovên ji xwîna wî dikevin erdê, agir bi dar û daristanên ku di biçûkatiya xwe de, tê de dîlîst, diket. Lewre jî leşkeriya ku dikir, bû sedema xwe naskirinê... 4 meh berê guh da dengê wijdanê xwe û ji karê xwe ye leşkeriyê îstîfa kir. Me li Stenbolê Mustafa K... dît, pirsên me bersivandin...

Wekî xortekî kurd, piştî leşkeriyê sedem çî bûn ku hûn bûn astsûbay?

● Belê beriya her tiştî ez dixwazim bibêjim ku ez di sala 1969'an de li bajarêkî Kurdistanê ku radeya bêkariyê (işsizlik) lê gelek bilind e, hatime dinê. Ez biçûkê heft bira bûm. Bêyî xwesteka min, birayên min di temenê minê biçûk de ez dame zewicandin. Piştî mehekê diya min çû rehetê. Xwestin ku min bîdin xwendin. Lê min nedixwest, ji ber ku zewac xistibûn stûyê min. Lewre jî diviyabû ku ez bişixuliyama. Ji bo debara malbata xwe. Ez çend salan li qehwexane, karê avahiyên û karên hwd. xebitîm. Peryên ku min distandin jî birayên min

ji destê min digirtin. Êdî min nikaribû debara mala xwe jî bikira. Hemû jinbirê min lêzimên hev bûn, her çiqas pîreka min kurd be jî bi tenê ew di nav wan de wekî biyanan dihat hesabandin. Lewre tam nedidan pîreka min jî.

Hê ez neçûbûm leşkeriyê zarokekî me çêbûbû. Piştî demekê ez mecbûr mam û çûm leşkeriyê. Lê li leşkeriyê xeber dihat ku birayên min li pîreka min nedihêrtin. Welhasil ji bêçaretiyê û ji qehran roj hat ku ez ketime rewşeke ge-

Di navbera min û femandarekî de axaftinek derbas bû. Wî ji min re wiha got: "Astsûbayê min li vê tabûra hanê wekî "kêriya kûçikan" kurd hene, dema ku ew leşkeriyê xilas dikin, dibin mîlîtanê PKK'ê. Divê mirov tevahiya wan bibe çiya û newalan benzîr bi ser wan de bike û wan bişewitine."

lekî xerab. Psikolojiya min xera bû. Ji ber van sedeman, li leşkeriyê wekî her sal îmtihanên astsûbayiyê dîsa wê çêbûya, ez gelek fikirîm, beşdar bûm û min îmtihana astsûbayiyê kar kir. Ji wê rojê û şûn de, di jiyana min de qonaxeke nû dest pê kir. Îcar ez dixwazim ji te pirs bikim, gelo tu bûya te yê çî bikira?

Li leşkeriyê bi çavêkî çawa li leşkerên kurd dihat nêrîn, di operasyonan de rola leşkerên kurd çî bû?

● Wekî tê zanîn; berê leşkerên kurd dişandin herêmên Rojava, yên tirk jî dişandin hêla me Rojhilat. Vê gavê berevajiyê vê yekê tê kirin. Leşkerên kurd dîsa li herêma xwe dimînin û bi hinceta ku dibêjin "Ew derdorê nas dikin", wan dişînin nav operasyonên şer. Di lihevxiştina de ji leşkerên ku têne kuştin, hejmar kesên kurd ne hîndik e. Ez dixwazim der barê vê yekê de minakekê bidim: Rojekê ez nû çûbûm yekemîneyeke leşkerî li herêma Botan. Di navbera min û

femandarekî payebilind de axaftinek derbas bû. Wî ji min re wiha got: "Astsûbayê min li vê tabûra hanê wekî "kêriya kûçikan" kurd hene, dema ku ew leşkeriyê xilas dikin, tevahiya wan dibin mîlîtanê PKK'ê. Divê mirov tevahiya wan bi hinceta derketina operasyonan, bibe çiya û newalan, ne bi guleyan, gule jî heyf in, benzîr bi ser wan da bike û wan bişewitîne." Wê carê min jî got: "Femandarê min ez jî kurd im" Hêrs bû û rabû ji cem min çû. Pişt re ez hîn bûm ku wî seba vî giliyê min li cem femandarê tabûrê kiri-

ye, gotiye ku ew "neteweperestekî kurd e" lewre jî femandarên min bi awayekî tundî dihatin ser min. Gelek karên zor bi min didan kirin. Min jî ew kar dikirin. Ez bi kurtahî bibêjim, her çiqas ez astsûbayeke artêşa tirk bûm jî, di çavên wan û dilên wan de ez wekî marekî reş bûm.

Em werin ser dîtî û ramanên leşkeran li ser gundiyan kurd. Bi awayekî çawa nêzîktêdayîn û reaksiyon dihatê nîşandayîn?

● Di bersiva pirsê berê de min dîtina li ser leşkerên kurd anibû ziman. Îcar hûn bifikirin ew artêşa kû li qismekî leşkerê xwe bi çavêkî neyartî binêre, wê bi çavêkî çawa li gundiyan kurd binêre? Gelek caran wezîfe didane me, ji hêla femandarên mezin ve. Bi awayekî xisûsî leşker û astsûbayên wekî min kurd, dişandin ji bo operasyon û lêgerînan. Ji bo ku çavreşiya di nav kurdan de zêde bikin.

Rojekê dîsa ji bo lêgerîna malan leşker çûbûn gundekî. Ji wan re hatiye gotin ku qaşo "Apoci" hatine vî gundî. Leşkeran bêyî ku li deriyê malan bixin, deriyê malan dişikandin, bi darê zorê kesên di malan de ji xew radikirin û ew derdixistin derve ser benderan. Gelek caran ku dikevin malan, keç û bûkên xame yên di mal de bi awayekî ne-musaft dibînin. Tabî tiştên bi vî rengî li xweşa gelek leşker û qumandarî dihat. Gelek caran leşkeran li cem pîrek û zarokên wî gef li zîlamê malê dixwarin, li wî didan. Rojekê dîsa em bi mebesta operasyonê çûn gundekî, li herêma Mêrdînê, me li derî xist, xwediyê malê jî ber ku derî dereng vekir, leşkerêkî 20 salî êrîş bir ser wan, çêr kirin. Wê gavê jî di quncika hundir de, kal û pîreke 70-75 salî rûniştibûn. Hema me dît ku leşker bi riha kalê pîr girtiye û dikişîne. Jinika pîr li dijî vê yekê hew îdare kir û gunehê xwe bi xwe anî û giriya. Lewra ji min "rûtblîtir" femandarekî heye, ez nikarim dengê xwe jî bikim, lê ez di cihê xwe de wekî biteqim ew çend ku ez qehirîmê. Piştî ku em hatin yekîneya leşkeriyê, min gazî wî leşkerî kir, ji Kayseriyê bû, ji sedemên beredayî min têra wî lê xist û min got "de here".. Pişt re heman leşker çûye giliyê min bi "Bölük komutanı" kiriye. Kumandar îfadeya min girt û got: "Ma tu nizanî lîxistina leşkerê tirk qedexe ye" pişt re jî 7 roj hepsa odayê dane min. Piştî vê bûyerê jî bo ku piyên min-bişewitînin gelekî li dor min çûn û hatin.

Bi giştî li kîjan herêmê te xebata leşkeriyê kir?

● Ez li gelek deveran mam. Çend deverê ku ez ji te re bibêjim Dêrsim, Hekarî, Şernex, Bingol û Mêrdîn. Ez bi piranî wekî sirgunî diçûm wan deran. Beriya ku ez herim wan deran, dosyeya min diçû...

Li leşkeriyê wezîfeya ku te dikir çî bû?

...d Mustafa K... ot 'êdî bes e!'

Tu serokê çend leşkeran bûyî?

● Ez "qumandarê tîman" bûm. Ez bi piranî li biryargehan dimam, lê carinan jî em derdiketin operasyonan.

Tu rol û bandora malbata we li ser we çêbû ku hûn bûne Astsûbay. Gelo li hemberî vê yekê reaksiyon nîşan dan an na?

● Wekî min berê jî gotibû em heft bira ne. Rewşa wan jî balkêş e. Yek Refahçî ye, yek HADEPî ye, yek Hîzbûllahçî ye, yek jî welatparêz e. Her du yên din kes nizane çi ne. Bi tenê 2 birayên min li hemberî vê yekê derketin, ew qas ku reaksiyonên tûj nîşan dan gotin: "Tu xayin î" lê birayê min ê mezin û yên din bi vê yekê gelek kêfxweş bûbûn. Heta ez pîroz dikirim û digotin ev peywireke pîroz e. Ji ber ku êdî meaşeke min a baş jî hebû. Birayê min ê ku beriya mehekê silava Xwedê nedida min, piştî ku hîn bû ez 75 milyon meaş distûnim, her hefte 2-3 caran telefonî min dikir. Qey ev jî "Adil Duzena" Refahê bû. Heta birayên min ên Refahî dihatin wan cihên dûr ziyareta min, ji min re diyarî dianîn. Wê gavê min faşîstiya wan bi awayeke zelaal dît. Di nav malbata me de, gelek xizmên me yên welatparêz û demokrat bi dehan caran reaksiyon nîşan didan û ji birayên min re digotin: "Ev bênamûsî ye bila birayê te dev ji wî karê qirêj berde", lê xwe diqehirand û aciz dikir birayê min. Di destpêkê de min digot "çi qas ev birayên min baş in" ji ber ku bûbûn alîkar ku ez bibim astsûbay, lê piştî ku min kirinên arêşa tirk li hemberî gelê belengaz û perîşan dît, min ji birayên xwe nefret kir.

Belê em werin ser mijara bingehîn. Çi bû sedem ku we ji artêşa tirk îstîfa kir?

● Heval gotineke pêşiyar a navdar heye, nizanîm kurdî ye an tirkî ye. Lê bi piranî bi tirkî tê gotin: "Zararî neresin, den dönersen kar dir (Mirov ji ku dera zerarê vegere, kar e)..." Îcar rewşa min jî girêdayî vê mijarê ye. Ez nabêjim ez ji zerarê vegeriyam, ez dibêjim ji bênamûsiyê vegeriyam. Min 4 salan bênamûsî kir.

Ez hê jî şaş dibim û li xwe nifiran dibarînim ku çawa ez 4 salan di nav vê xebatê de mam. Ji ber ku li ber çavên min, digotin "Ez di diya kurdan...", "Kullû ermenî kurd", "Navê şkefta te çi ye", "Yürü lan kurd o." Agirên ku bi dar û daristanan diketin hê jî ji hiş û aqilê min dernakeve.

Peywendî û têkiliyên di navbera cerdevan û leşkeran de çawa bûn. Dibêjin di navbera wan de nakokî û alozî hene?



Dewleta tirk ji bo leşkeran merasîman li dar naxe. Lê ji bo fermendarên ku têne kuştin jî merasîmên propagandayî pêk tîne, ev jî nîşan dide ku dewlet çi qas girîngiyê dide leşkeran û bi taybetî jî leşkerên xwe yên kurd.

● Peywendî û têkiliyên di navbera leşker û cerdevanan de di pêvajoya operasyonan de baş e. Ji ber ku cerdevan riyarî dizanin. Lê piştî re dema ku operasyon tunebe leşker tu qedr û qîmetê nîşanî qorciyan nadin. Tiştê herî rast jî ev e ku tu car bawerîya leşkeran bi qorciyan nehate û nayê jî. Her dem durûtî li holê ye. Gelek caran cerdevan ji bo malbata xwe ji bajêr nan, erzak dianîn leşkeran, qismekî mezin ji wan distandin û digotin hûn van tiştan didin PKK'ê.

Di warê cerdevantiyê de gelek zordarî dihatê kirin?

● Îro zarokê 7 salî jî dizane ku li ge-

Ez hê jî şaş dibim û li xwe nifiran dibarînim ku çawa ez 4 salan di nav vê xebatê de mam. Ji ber ku li ber çavên min, digotin "Ez di diya kurdan...", "Kullû ermenî kurd", "Navê şkefta te çi ye", "Yürü lan kurd o." Agirên ku bi dar û daristanan diketin hê jî ji hiş û aqilê min dernakeve.

lek deveran qoriciyê bi darê zorê tê kirin. Min bi çavê xwe dît bi sedan kes ji ber ku nebûne cerdevan xaniyê wan li ber çavê wan û zarokên wan bêtî ku bihêlin ew erzak-mezrzkê xwe derxin hatin, şewitandin. Digotin: "Hûnê bibin cerdevan an jî hûnê siktir bibin herin, nexwe emê we bikujin." Gelek kes jî ji bêçaretîyê, ji ber ku tu cih û dever tune ye ku herin di cihê xwe de mane û bûne cerdevan lê kezeba wan jî dişewite. Rojekê yekî cerdevan, piştî ku hîn bû ku ez kurd im hate ba min û got: "Divê tu tif bikî rûyê min" lewre ku ew qas hêrs bûbû û ji wî halê

xwe aciz bûbû.

Di nav artêşê de rewşa psîkolojiya leşkeran çawa bû?

● Di nav artêşê de mirov nikare behsa psîkolojiyê bike, psîkoloji çi ye? Ancax mirov dikare bêmoralfî û kambaxiyê bîne zimên: Hinek leşker hene ku dilxwaz in, bi dilê xwe tên. Hinek jî hene ku ji bo li Rojhilat leşkeriyê bikin torpîl jî çêdikin. Ev jî sedema perwerdehiyê faşîzma e. Lê piştî ku tên, poşmam dibin, gelek ji wan dikevin nav kiryarên ecêb bi şev xewnerêşkan (kabûs) dibînin. Xwe dikujin, hevalê xwe dikujin. Xewnerêşkên wan tê radeyeke wiha ku êdî aqilê xwe

winda dikin. Di mînakeke dema operasyonan de leşker kumanyayên ku dema wan boriye û xera bûne dixwin, lê qumandar xwarinên herî xweş dixwin, ava jî 'Pinar Şaşale' vedixwin, lê gelek caran leşker di operasyonan de ava vexwarinê nabînin. Dîsa leşkerê ku bi şev û roj nobeta fermendarê xwe digire, tazî, birçî û tî ye. Li hêla din fermendarê ku derdora wî bi nobedaran hatiye pêçan tv, radyo, pirtûk, xwarin, vexwarina wî li ber sekinî ye, leşkerê ku vê rewşê bibîne wê psîkolojiya wî çawa be gelo?

Gelek caran leşkeran derdixin ber ka-

merayên tv'yan, ew jî dibêjin: "Em baş in", "teror nemaye", "bila wetan sax be." Ew tev bêdilê xwe van tiştan dibêjin. Di operasyonan de ji ber ku helikopter zû nayên, gelek leşker dimirin. Di vî warî de dixwazim mînakekê bidim te. Rojekê leşkerê ji ber tariya şevê vediceneqê û sê guleya berdide fermendarê xwe. Şevê nivê şevê ji bo wî fermendarî helikopter hat û ew rakirin nexweşxaneyê. Lê dotira rojê leşkerê pî li mayinê kir, gelek xwîn jê çûbû, helikopter xwestin. Ji meqamên bilind tu dizanî çi hate gotin? Gotin: "Ew kesê birîndar fermendar e, an leşker e?" Dema ku gotin leşker e, wê gavê jî gotin tarî ye, helikopter nayê. Lewre jî leşker mir. Ji ber van sedeman qey psîkoloji bi kesî re dimîne.

Cara dawî mesajek an gotineke ku hûn ji gelê kurd re bibêjin heye gelo?

● Belê... Cara dawî ez dixwazim ji gelê xwe re bibêjim ku zarokên xwe qet ji nasnâmeya wan dûr nehêlin. Beriya ku ez bibim astsûbay tu kesî bi destê min negirt, negotin wiha bike, ev yek baş e, ev ne baş e. Piştî re jî rabûn ji min re gotin: "Tu xayin î" belê dibe ku ev fikra wan e, lê ew di cihê min de bûna gelo wê çi bikirana. Bi rastî jî berê çend kesên navsere derketana, riyek nîşanê min bidana, belkî ez îro ne li vir bûm jî. Vê gavê wî jandane min rehet e, lê ji bo demê berê ez ji gelê xwe lêborîna xwe dixwazim. Gelek caran dibe ku nan li ber zarokên min tune be, lê serê me rehet e, hizûra me heye...

HEVPEYVÎN: SALIHÊ KEVIRBIRÎ

Çend helbestên bijarte

Em û mirin

Şev tarî
 Şev serma
 Şev wek hukmê gule giran in
 Yên ku bi şev gule diteqîn in ew in,
 Yên ku ji rojê direvin
 Tirsonêk, bêgan û yên bédil in
 Em zarokên ku şîr ji pêstîrên senfoniya
 gelawêjê mijîne
 Me bi bedenên xwe yên tazî alay
 anîne amanê
 Em leşkerên qumandarên gelawêjê ne
 Em ên ku li newalên Agirî kezeba xwe
 bi destên xwe jê kirine
 Em wekî Ferrûhan diçûn mirinê
 Me weke Raşanan kenîn fikir felsefe
 Em ên ku li ber "Komara serjêkeran"
 serî rakirine.

Mirin ji me re dikare bibêje çi?
 Mirin mir bexê min, mirin hat kuştin
 Mirin kete bin erdê, tevî
 "jiyana nexweş"
 Û me evîn afirand, kîna me
 zîl daye êdî..

Hêstir

Hêstirên ku ji çavên min dirijyan
 Dilop bi dilop rêz bûn, gîstin dîlan



Bûn agir û pêtî, kîn, tohildan
 Bûn hêvî û serihildan
 Bûn kanî û çem, rûbar
 Bûn Dicle û Ferat diherikin bê
 rawestan
 Ber bi bajarên ve ji bilindahiya
 çiyân...

Keviya bêtenêtiyê

Ji van êvarên nîvtarî
 Pêjna dilên evîndar tê
 me ji keviya bêtenêtiyê
 Hildigire, bi xwe re dibe..
 Cihê ku em tê derbas dibin
 Geliyê "her tişt gengaz e"

Bombe ya ku pîma wê kişiyaye
 Demên wî yên dawî ne ku em tê dijîn
 Ango, bi biryariyeke xweber
 Evîna min, hêviyên min
 Lê mirin xayîn, mirin bêbext
 Tilî li ser tetik, lê tilî bêbext
 Berdêl xwîn...

ROŞAN LEZGÎN

Zarokê Sason

Tu şehîdê Mereto
 Stêrk
 Kulîlk û zarok bê buha ne
 Bipirsîn ji Sasonê
 Dilewa pir giran e
 Li Mereto ferman e
 Zarokên Sason
 Dêrxistin serê çiyân e
 Bûne esîrê destê leşkerên tirkên
 Wan digerin li nav mayînan e
 Tu şahîdê Mereto
 Stêrk tefîyan
 Kulîlk çîlmisîn
 Zarok heliyan li Sasonê.

Bîranîna şehîd Cengîz

Bayekî mirinê bû
 Tu ji me qetandî
 Sê sal derbas bûn
 Lê me ji bîr nekiriye
 Wek doh
 Li ber çavê min e
 Xwîna xortê ciwan
 Hê şil e, zîwa nebûye
 Li devê derye Nexweşxana
 Batmanê,
 Çîlmisîna zarokên şehîda
 Wekî pizotek agirê xwe berde
 ser dilê min

Ev rewş roj bi roj dişewifîne
 kezeba min
 Çavên dayikan qerimîn
 Li benda hêviyan
 Erd qelişîn ji tîna
 Li kêvala çemê Amed dihesim
 li nalîna
 Xeyala min dikşîne
 Di tahtê de bilind bûye derxeke
 şîn e
 Dibê min bibîne
 Çiya ji rê da min
 got minet nîn e
 ji xerîbiyê min xatir xwest
 bila çavê dayika min li rîya
 min nemîne
 AZAD ŞÎRÎN

Ez Egîd im

Ez Egîd im li her der im
 Li nav kozik û çeper im
 bi dilek kul û keder im
 Bo azadiyê karker im
 Gelek tiştan naxwazim
 Ne şev, ne jî roj dirazim
 Ne bakur tenê dixwazim
 Ez welatê xwe dixwazim
 Havîn û hem zivistan
 Ser çiyayên Kurdistan
 Bo xwînmijên faşîstan
 Ezê bikim goristan!
 Bi biryar im namirin
 Ji vê dozê nazivirim
 Ji gelê xwe re rêber im

Hêvî û şoresger im

15'ê tebaxê

Her bijî 15'ê tebax
 Te agir rakir ji ax
 Em razabûn ta wê çax
 Gel rabû ji xewa kâmbax
 Destpêka salnama kurdan
 Karker avdan deşt û zozan
 Tu nemirî Mazlum Doğan
 Dîrok nû kir bi berxwedan
 Deşt û çiya û newalan
 Paqij kirin ji neyaran
 Cih û warê Memê Alan
 Rizgar kirin rêhevalan
 RÊBER-RONÎ GOYAN



Li navendên çandê çalakiyên ve hefteyê
Li NÇM'ya Stenbolê

● 10.08.1997 Yekşem:

Dengbêj Salihê Qûbînê saet: 14.30

● 16.08.1997 Şemf:

Konser Koma Çiya, saet: 14.30

NÇM Beşa sînemayê film: Kuhle Wampe, derhêner B.Brecht,
saet:18.00

Li NÇM'ya Izmirê

● 10.08.1997 Yekşem:

Konser Ismet Dağ saet: 18.30

Li Pêşangeha Karsu.Tekstil Sanat: Pêşandina wêneyên, Cemal
Endem hûn dikarin hetanf 30'ê gelawêjê temaşe bikin.

Galeriya Mine Sanat: Pêşandina 10'an ya hunerên hemdem
heye, hûn dikarin hetanf 29'ê rêzberê herin lê temaşe bikin.

AWIR

Mihri Belli: PKK ji berê xurtir e

Roja şemiyê 2.8.1997'an li Emek Kùltür Merkezi gotûbêjek bi sernavê "pirse-girkên rojane" ji aliyê nivîskar Mihri Belli ve hate dayîn.

Di gotûbêjê de Mihri Belli pêşî li ser saltanata Abdulhamid axivî û bi bir xist ku saltanata 30 salî ya Abdulhamid ji aliyê contîrkan ve hate ji text hate xistin. Nivîskar Belli ev yek şibande şoreşa burjuvazî û di berdevama axaftina xwe de got ku tekoşîna Meşrûyetê ya li hemberî saltanata Abdulhamid baş e, ji ber ku di îdareya meşrûtiyê de her tişt bi paşayan ve ne girêdayî ye. Giş mesele bi parlamentoyê ve girêdayî ne. Belê Swed û Îngilistan jî bi sistema meşrû tèn îdare kirin.

Belli paşê jî li ser şerê rizgariyê ya tirk rawestiya û da zanîn ku piştî komala tirk ava bû, bi rejîma leşkerî ya kema-rist hate îdarekirin. "Sistema yek-partîtiyê" ji bo rayedaran her tim îdareya leşkerî ji ya sivil baştir bûye. Her wiha Belli li ser rewşa Tirkiyeyê ya dema 27'ê gulanê jî rawestiya û got ku zagona sala 1961'ê zagona burjuwaziyê biçûk ê herî pêşverû bûye.

Her wiha Mihri Belli li ser 12'ê rêzberê jî rawestiya û da zanîn ku, 12'rêzberê dema pêşketina tarîkatan bû, ji ber wê yekê jî bo tarîkatan dema herî baştirîn bû. Belli got ku dema li Tirkiyeyê darbeya 12'ê rêzberê dibe, Generalekî Amerîkî "Zariyên me karê xwe pêk anîn" dibêje, kî ne ev zarî, zariyên CIA'ye ye ne.

Belli piştî hin tespitan derbasî kêşeya hundiirîn yên îro bûn û bi bir xist ku, îro kêşeya yekemîn li Tirkiyeyê kêşeya kurdan e. Ev bi salan e ku xwîn tê rijandin, hinekan jî bi laîstizmê girtine û bernadin. Belli dîsa bi bir xist ku darbeya herî faşîst di sala 1993'yan de çêbûye. Ew jî ji aliyê Çiller, Güreş Paşa ve bi piştigiriya CHP'ê pêk hatiye. Bi awayê ku Belli di dibêje di serdema vê rêveberiyê de sê hezar gund hatine şewitandin, bi qasî wê failê meçhul pêk hatine. Lê tu kî pirs nekiriye ev çi ye, çi dibe? Belli gotina xwe wiha domand: "Eşref Bitlis çû, Bahtiyar Aydın çû dîsa kesî qala wan nekir." Mihri Belli daxuyand ku di ser mirina wan de 24 saet derbas nebû Güreş îmzeya xwe avêtîyê "Ev qaza ye" naxwe ew jî şirikê ve kuştinê ye.

Rewşenbîrê tirk Mihri Belli di berde-



wama axaftina xwe de li ser operasyonan jî rawestiya û got ku ji Tirkiyeyê kirî ku, bi van kirinan wê meydan jê re bîmîne! Lê, PKK îro ji berê xurtir e. Piştê jî Belli wiha got: "Tu bi operasyonên bi sedhezari li dar dixî, lê nikarî li hemberî PKK'ê bisekinî, encam çi ye fiyasko, mirov dimirin."

Her wiha nivîskar Belli, li ser lêkolîna Serkaniya Giştî ya der barê hîlbijartina giştî de jî rawestiya û got ku di lêkolîna Serkaniya Giştî de HADEP %6.7 derketiye, Serkaniya Giştî jî ji hikûmetê re gotiye: "Heger hûn barajê daxin wê HADEP bikeve meclîsê."

Întixara siyasî ya ÖDP's

Rewşenbîrê şoreşger û înternasyonist Mihri Belli bi şeweyekî tûj bi ser ÖDP'ê de çû û daxuyand ku, ÖDP'ê xwestiye ku berî şahiya xwe ya li Zîndana Yedikule çelengekê deyne ser mezê mehmecîkan! Belli hêrs bû û axaftina xwe wiha domand: "Naxwe cudahiya te ji partiyên din çi ye? Heke hûn ewqas wêrek in herin çelengê dêynin ser mezê gerilayan jî. Îmzeya CHP'ê û SODEP'ê di bin valakirina sê hezar gund, bi qasî wê koç kirin û bi qasî wê jî kuştinên faîlî meçhul de heye." Belli ÖDP qest kir û got: "Tu jî here bi wan re nizamim çi bike. Ev întixareke siyasî ye û xayîntî ye."

Banga Yekîtiyê

Mihri Belli di dawîya axaftina xwe de banga yekîtiyê kir: Werin em bi hev re koordinasyonê çêbikin, bila weşaneke me jî hebe. Em livbaziye hevpar bi hev re rêxistin bikin, em li otobûsa siwar bin bin propagandeya xwe bikin û xwe ji marjînalîyê xilas bikin û em dikarin jî barajê jî derbas bin."

AZAD ALTUN

TÎŞK

KURŞID MÎRZENGÎ



Nirxa hunermendan

Kurd tu wextê li nirx û hêjahiyên xwe xwedî demeketine, nizanin hêjahî çi ye. Li ba kurdan hemû tişt li bajara çarşiya şewitî erzan e. Huner çi ye, pîşe çi ye, rûmetdayîna hunerê çi ye gelek kurd nizanin. Ji ber vê nezaniyê hunermend û xwendeyên kurd bi dîkuliye bar dikin û diçin qata Xwedê.

Mîqdad Bedirxan Beg di rojnameya Kurdistan de qiriyaye, hawar kiriye û li def û dahûla daye. Ji kurdan re lavayî kiriye, dexalat kiriye, xwe avêtîye û gotiye: "Ez ji we hêvî dikim, ez ji we tika dikim, bixwînin, zarokên xwe bidin xwendin. Nîjad bi xwendin û nivîsandinê bi pêş ve diçin, bi xwendin û zan-abûnê bi ser dikevin. Ên nexwende û nezan tim û tim xulam û welamê xelkê ne." Lê mixabin kesî dengê Mîqdad Beg nebihîstîye. Hezar li gora wî bin û di nava nûrê de bijî.

Ziya Gökalpê ku çû bû turanî, li Amedê rojnameya Peymanê" derdixê û bi kurdî û osmanî hawar û gaziyar dike. Diqîre, ji serê kuçeke Amedê baz dide ser qolçeya kolan dinê û heya deng jê derê bangî kurdan dike û dibêje: "Gelî meqûl û begên kurdan, ez di bextê kûçikên we de me, zarokên kurdan bidin xwendin." Lê mixabin ew hewldana Ziya tewş e. Kurd tinaz û qerfên xwe bi Ziya dikin, Ziya dixin nava krîzê derûnî, ji qehr û mereza kurdan Ziya şeşderbê dikişîne û berî textika eniya xwe dide. Lê namire ji hêrsan, ji silbûnê terkî welat dike û berê xwe dide çol û beyarên hinekên din. Yên ne dostên me. Ziya sond xwariye, wê li miqabilî kurdan binivîsîne. Îcar em hemû dizanin ku ziya çû bû çî. Tirk bi saya wî bûn xwediyê îdeolojiyê. Îro jî ew îdeoloji bûye belaya serê me. Kul li Ziya keta, wê çaxê bimira em jê pak dibûn.

Seidê Kurdî ango Bedî-Zeman Seidê Nûrsî heya dawîya temenê xwe ye heftê û çar salî sed û sî heşt cild pirtûk nivîsîn. Di rêzek nivîsa xwe de wiha dibêje: "Ez gelek bextiyar im ku di rehên min de xwîna kurdî digere..." Di vê hevoka Şêxê nemir da xuya ye ku şev û roj dilê wî çawa hilavêtiye. Ji bo kurd û Kurdistanê agirekî çawa di kana dilê wî de veketiye. Lê ji bêxwedîtiyê xwe avêtîye qeraxê çemekî din û li wê hêla avê şerê neqance û zaliman kiriye. Lê her xwedahî bûye û hevalê jaran û rebenan bûye. Çaxê li Rihayê çû ser dîlo-vaniya xwe li ser qenciya Xwedê, tenê misînê wî ye destmêjê, tezbîheke wî ya diakirinê hebûn. Xwedê rehma xwe lê bike û di bihuştê de cîranê Îdrîs be.

Mîr Celadet Bedirxan, begê hebû. Ez bi xulamê wê mîrîtiya wî bim. Mîrê zirav di kovara Hewarê de derketiye, çûye serê çiyayê Agirî, çûye bûlana çiyayê Herekolê daketiye hesû û neqebên çiyayê Ezîzan û gazî kurdan kiriye. Lê dengê mîrê zirav li Şamê negihaye kurdan. Di nava zeviyeke beyar de ji bêxwedîtiyê ketiye birê û fetisiye... Mîrê zirav neh ziman dizanîn, lê neçû di zanîngehan û akademyan de ders nedan, hatibû li Şamê kuling girtibû, bir dikola.

Ax dinyayê... Gelo tu çima wiha xayîn î?

Belê ew çend mînak jî bes in ji bo naskirina helwesta kurdan a li hemberî huner û hunermendan, bîrbir û rewşenbîran.

Elî li vir e, lê Mihê ne li vir e, ne li wir e

Pîştî nîvro siyê xwe bi ser girê Keloşkêrê de hêdî hêdî berdida. Ji dûr ve siya dara gwiçê gilover weke dîmenê atoma Hiroşîmayê dixuya.

Li hêla din dema sî dadiket ser her du zinarên berkula şevreşka. Hecî Bektaş an Giriş digot asr e. Tê gotin carê ew û çend mirovan li Zimêg li bin dara hirmiyê rûniştîbûne, mela azana esrê bang daye, wî gotiye hîn ji esrê re bi qasî siya mirovekî maye. Kêliyekê şûn de mela di heparloyê de lêborîna xwe xwestiye. Her wiha nîvro bi siya gopelê taştê rojê li nutike kevirê bel bixistana.

Ro çû ava. Êvar bû. Emele û yên bi devşûgî ji bo patoza wî hatibûn li dora benderê kom bûn. Piştî amadekariya milev, yabe, qalûç û bêjîngan, patozvan li dijî navê Têfik saet 8.45 nivîsand û patoz li kar xist.

Patozvan ji ber ku kayiş (tak) sist girê dida, her tim qayişê diavêt.

Têfik xwe dabû ber devê patozê, jina wî ya sêyemîn Bozanê jî tevî halanan bi emeleyan re genim diavêtin ber. Dema Têfik radihişt yabê ji piştîyekî zêditir genim bi ser ve dikir.

Piştî saetekê ba rabû ka û kapola benderê tev de bi ser wan de pûzikand. Bû kuxte kuxta wan.

Têfik dît ku ka tev li erdê nakeve, her du destên xwe berjêr wergirtin û gazî kir:

Xwedêyo! Êdî bes e ma çi qeda û belayê: te hene, dibê qey te ji me re hilanîne.

Jina wî peşîna axîna kûr gotê:

– Bayo Elî li vir, bayo Elî li vir.

(Wek niha dema ba dihat gundiyan gazî Hz. Elî dikir)

Yekî din got:

– Gelo ma Xwedê hiş ji me standiye, çima em motorê nasekinînin.

Motor sekinandin. Emeleyên betilî hinekan bi solên xwe ji xwe re li ser axê cih çêkirin, hinekan jî xwe evêtin ser pûşê genim û bi xew ve çûn.

Nivê şevê bû, çend reşayî ji ber kêvirê hefşo xwe berdan xwar (daketin), çiqas hatin mezin bûn, mezin bûn, bûn însan.

Fermandar jî dema dest bi axaftinê kir wisa got:

Xweşikno! birano! dayikno bavno!

Wekî ku hûn jî dizanin ev hereketa (partiya), hereketeke însanîyê ye. Berê mafê gelê kurd ê perçiqandî pişt re di şexsê gelê kurd de mafê tevahiya gelên

bindest diparêze û ji bo wê têdikoşe. Bi kurtî em dikarin bibêjin hêzeke welatparêz, hêzeke insanî ye.

Li ser vê axaftinê yên ku ji gemara kayê serê xwe nedixurandin jî, serê xwe xurandin. Hinekî din tevîzinok kişandin, hinekan jî bawîşk anîn û gotin:

– Tu rast dibêjî, mafê te ye.

Paşîv anîn, bi hev re xwarin. Donê (rûnê) tirşîka balîcana hişk bûbû bi simbelê wan ve dizeliqî. Ji savarê jî bêhna kuzûriyê dihat (dûyê sergîna). Têfik careke din hêrs bû û got:

– Ma qîzê kera dibê qey tat bûne sê jî-nê wek qantiran nikarin agir dadin, savarê li ser sergînan çêdikin.

Li kêleka fermandar yekî kinik û simbel qirboz (pala) û zendê destê wî wekî hetê Têfik stûr peyivî:

– Xalo! an jî ez bibêjim heval.

Şerm e ku hûn ji bo savarê ji dayikên me re çêrên wisa nebaş dikin. Lê bi rastî em tenê ji xwe re xurt in. Dema neyar we li qada gund ji bo tiştêkî tewş jî dicivîne û çî karê pis heye bi serê we da tîne, hûn nikarin bi qasî serê derziyê jî ji eyarê xwe derkevin.

Yekî emele:

– Tu xweş dibêjî, lê balafirê me tunin balafirên me.

Na! got ê ku dipeyivî?

– Berî balafirên me dil, dilekî pola divê, dema dil hebe û netirse ne tank, ne top ne jî balafir dikare bi me bavilkê bike. Aha ji we re Wîetnam, Fîlistîn, Çeçen, nêzîktir, Şemrex, Nîsêbîn, Licê ta bi Dîgorê.

Peyv qediyên (kuta bûn), her kes çû ser karê xwe. Heyv ber bi Rohilata Navîn çû. Leyl û Mecnûn derket. Stêrkek di ser rîya Kadîza re xwircî. Dayika Mihê kelogirî bû.

– Gelo dîsa kî mir, çîraya mala kê temirî. Aso ji hêla çiyayê Elafê ve sor bû. Roj wekî gogeke zêrîn dixuya. Tîrêjên rojê berê li Zimagê diket, berojê kol e. Pêda pêda her der rapêça.

Tav bilind bû, li kevirê bel xist, şivanan pez anîn dana (beriyê), pêşî berx marîyan, piştî pez, şivan qîriyan dû re berxan û bêrîvan... Dengê wan wekî senfonîyêke olan da çiyayê Hefşo.

Ba rabû, bû bahoz, bablîsok tofan (bobalet) Elî li vir, Elî li vir.

Lê êdî Mihê ne li vir, ne li wir bû.

M. MÎRXAN

Nîşe: (Mihê: Muhyetin Menteş di 7'ê tîrmeha 96'an de li Paloyê şehîd ket)



Kovara danasîna

Berhemên gelê Mezopotamyayê

Heke em vegerin ser naveroka kovara Cihana Weşanan, em dikarin bibêjin ku nivîskarên kovarê karekî hêja kirine. Di nava kovarê de danasîna 8 pirtûkên li ser mijarên cur bi cur û bi zimanên cihê hatiye kirin.

Pirtûkxaneya zimanê kurdî bi weşan û berhemên nû her diçe dewlementir dibe. Bi vê yekê re karê nixandina wan berhemana jî bi pêş dikeve. Şeweyê berê yê nixandî û danasîna berhemana cihê xwe jî şeweyê nû re dihêle. Berê bi tenê li ser berhemên nûderketî di rûpel û quncikên rojname û kovarên kurdî de nixandî û danasîna derdiketin. Kurd êdî di vî warî de jî dibin xwedî weşan. Belkî peyva kurd jî bo weşana ku emê qalê bikin ne di cihê xwe de be, lewre ew li ser weşanên gelên Mezopotamyayê radiweste.

Li gorî pêşgotina kovara Yayın Dünyası ango Cihana Weşanan, mebesta vê kovarê ew e ku di warê danasîna berhemên gelên Mezopotamyayê de bibe gaveke nû. Her wiha di pêşgotinê de hatiye daxuyandî ku mebesta amadekarên kovarê ew bûye ku bi çar zimanên gelê Mezopotamyayê (kurdî, tirkî, asûrî, ermenkî) weşanê bike, lê ji ber nebûna derfetan ew yek pêk nehatiye. Lewre jî kovar bi kurdî û tirkî derketiye. Di nav rûpelên kovarê bir û baweriya ku derdikeve pêş biratiya gelan e.


Kovar bi nivîseke li ser çawatiya danasîna dest pê dike, ew nivîs bi kurdî ye. Di vê nivîsê hinek rexne jî li şeweyê danasîna yê di weşanên kurdî, tê girtin. Li gorî nivîskarê vê nivîsê, kesên ku di weşanên kurdî danasîna berhemana dikin, pirî caran berhemana didarizînin. Her wiha tê gotin ku nivîskarê kurd ferqa danasîna û agahdariyê jî nizanin, çend agahiyên ku li ser berhemê tên dayîn wekî danasîna tê binavkirin.

Li vir divê mirov balê bikişîne ser xalekê. Ji bo bi-

navkirineke rast û durist pêdivî bi lîteratûreke hevgerî heye, bo nimûne di Azadiya Welat de agahdarkirina kurt wekî danasîna tê binavkirin, lê danasîna ku nivîskarê cihana weşanan dike, wekî nixandîna tê binavkirin. Tiştêkî din î ku divê li ser vê nivîsê bê gotin ku jî ew e ku di danasîna de mirov nikare qeyd û bendan deyne ber nivîskar, li gorî şemayan danasîna çênabe, bivê ne- vê hest û ramanên nivîskar, bir û baweriyên wî/wê jî di nava nixandîna de cihê xwe digirin. Li aliyê din wekî tê zanîn rexnegirî bi serê xwe beşeke zanistê ye, lê nivîskarên zimanê kurdî bi taybetî kurmançî negihîştine vê astê.

Heke em vegerin ser naveroka kovara Cihana Weşanan, em dikarin bibêjin ku nivîskarên kovarê karekî hêja kirine. Di nava kovarê de danasîna 8 pirtûkên li ser mijarên cur bi cur û bi zimanên cihê hatiye kirin. Ji van berhemana 5 heb bi tirkî ne û 3 heb jî bi kurdî ne. Divê bê gotin ku ji 5 hebên bi tirkî du heb li ser gelê asûrî û sê heb jî li ser kurdan in. Nivîskar hewl daye ku berhemên bi tirkî bi kurdan û yên bi kurdî bi tirkan û gelên din ku bi tirkî dizane bide nasîn. Lewre jî danasîna pirtûka Tomris Özden a bi navê "Şark Çibani" û pirtûka İsmail Beşikçi "Kendini Keşfeden Ulus Kürtler" bi kurdî hatiye kirin. Lê danasîna pirtûka Mahmûd Lewendî "Computera Ber Dilê min" û pirtûka Zeynelabidin Zinar "Xwendina Medrese" bi tirkî hatiye kirin. Tiştêkî ku nivîs xurtir kiriye jî ew e ku bi piraniya nivîskarên pirtûkan re kurte-hevpeyvînek hatiye kirin.

Di kovarê de nebûna bergê pêşin e pirtûka ku dana-



sîna wê hatiye kirin, wekî kêmasiyekê balê dikişîne. Her wiha şeweyê zimanê nivîsan gelekî dişibe hev, wekî ku hemû nivîs jî hêla yek kesî ve hatibin nivîsandî. Li aliyê din nebûna navê nivîskarên ku danasîna kirine vê şik û gumana mirov xurtir dike. Kovara Cihana Weşanan li Swêdê tê weşandin, gerîndeyê giştî yê vê kovarê Gabar Çıyan e. Kovar jî 28 rûpelan pêk hatiye.

Navnîşana xwestinê: Box 2010 14902 Nynas-hamn-Sweden

SERWISA ÇANDÊ

Nixandînek li ser erkên giyandaran

CELALETTİN YÖYLER



Di lîteratora zanistiya giyandaran de, bê cudatî navên hemû heyberên bi giyan, giyandar e. Lê ev giyandar jî, di wê zanistiyê de, du beş in. Yek: Giyandarên bi axaftin, ponijandin, rokirin û pîvandî in. Duda: yên bê axaftin û ponijandin. Her yek jî wan beşan jî, bi awayê karekterên xwe yên giyandarî xwedanê erk û karakterê taybet in. Wekî çawa ku mirovatî, hem heyineke pir bi rûmet, hem jî bîrpirsiyarê jî hinekî erkên pir hêja û giranbiha ne. Lewre bi gelemperî hemû tişt ne di cihan û asîman de, jî bo wî hatine afirandin û amadekirin. Her yek jî mirovekî li ser rûyê vê cihanê, endam e ji bo koma bine-mala mirovatiyê. A bi van ramanên divê ew kes, an ew komele jî ew gel li erkên xwe yên mirovahî, neteweyî û gelêrî xwedî derkeve. Lê çî dema mirov li erkên xwe yên mirovahî xwedî derneket û lê nebû xwedî, wê demê tu cudatî di navbera mirov û giyandarên bêzar û

bêponijandin de namîne. Lê belkî ew giyandarên bêzar û bêziman, li hemberî tu kesî ne berpirsiyar in. Lewre di hestên wan ên pê hesînî de, wateyên pir bi nix û bi rûmet hene. Heger mirov wan hestên wan ên dilnêrmî bi nixandîneke zanistî bi hûnêrîne bibîne, mirov dê rastî birek wateyên bi rûmet û girîng were. Wekî çawa ku em dibînin ji giyandarên bêziman qaz, mirîşk, hesp kûçik, ker çî dema mirovek an rewîrekî din ji cureyê wan êrîştî ser têtîk, canû, cewrik, xotikê yekî ji wan giyandaran bike, pê re em dibînin ji bo parastina wan 'hûrikên' xwe û reaksiyonên xwe didin diyarkirin. Ez dixwazim: Kurte nixandînekê bi awayê zanistî ya mirovnasîna (antropolojî) li ser mirovatiyê û hinekî ji giyandarên bêberpirs derxime rojevê û bi hûnêrînan binirxînim.

Wekî çawa ku em bêjin, du heb giyandarên dijber, yek 'mîroya' ya din jî 'ker' û 'se' hem jî ew 'ker' û 'se' yên ku mirova her tim heval û hogirên xwe, bi nerindî û kêr rûmetiya van her du giyandaran bi nav û nûçik dikin. Wekî çawa ku kesek jî yekê din re dibêje: Tu wek kerê yî, an jî wekî seyê yî. Em temaşe bikin ka ev her du giyandaran (mîrov û tarîş) hetanî kî derê wekî hev in, ji kî der şûn ve jî hev diqetin, lê ez neşas bim tu demê mirov teba, mîrov û dewar, ne wekhev in. Mîrov an pir

mezin e an jî pir biçûk e. Dema xwe li rengên xwe yên mirovahiyê bigire û rengên xwe yên bîrpirsiyê bi cih bîne, pir mezin û bilind e. Lê çî dema li xwe, li welatê xwe, li malbata xwe, li gelê xwe, li qîz û xortên xwe, nebû xwedî, wê demê ew û "teba" ew û rawir ne wekî hev in. Ew, ji hemû giyandarên bêziman jî "ker"ê jî "se"yê berjêrtir û kêmtir e. Dema ku em bibêjin: Ew mirov wekî kerê ye an wekî berazê ye, an wekî kûçik e, em wê demê adeyî û xirabiyê bi van heywanan re dikin. Lewre ev heywan erkên dikevin ser wan bîkêmayî pêk ûnîn. Wekî niha se li derê xwediyê xwe dir-eye. Ker barê xwediyê xwe hildigire. Lê mirovên ku erkên xwe yên mirovahî pêk naynin? Ew jî van heywanan pîstir in. Lewre, nan ji axa gelê xwe dixwin, lê barê dijminê xwe hildigirin. Faris dibêjin: "An kuca in kuca." Ango ker û kûçik li ku, evanên bênamûs li ku, yanî ne wekî hev in, ker û kûçik jî wan çêtir in, ji ber ku erkên xwe yên mirovahî pêk naynin. Mîrov heybereke pir mezin e, divê ku li wê heyîna xwe ya bêhempa xwedî derkeve. Lewra ev cihana xweş a bi hezaran neqîş û nemûş, ji bo wî hatiye avakirin. Lê çî dema ku li xwedîtiya xwe ya cihanê nebe xwedî pir bîrûmet dibe.

Deynê bakalî



werdin nêgenê û iyê torinan dê ci ra genê, ez xo rê tiya her roj nan bûri. Çimhal tornê mi bî, wa ê înan ra bigrê.

Lajek hema şino û wayir dê wardengehî ra pers keno û o jî vano: "Rast o, kam tiya nan weno, ma peranê ey torndê ey ra gemi."

Qisandê wayir dê wardengehî ser, lajek nişeno ro û wardengehî de çiçi esto, vano: "Mi rê biyarê."

Lajek çiçi wazeno garsonê werdengehî lajekî rê anê. Lajek xo rindê keno mird û werzeno ke şiro, ewneno garson hesabî ano û dano lajekî, lajek ewneno winî jew hesab amewo ke, jû meng jî bixeftiyo nêşeno ê hesabî bido, lajek hema veyndeno wayirdê wardengehî û vano:

- Şima werdengehî sero nûsto ke,

kam tiya nan bûro peranê ey madê tornê dê eyra bigim, la belê şimayê mi ra perey wazenê, gerek şima peranê mi tornê dê, mi ra bigrê.

Wayirê wardengehî vano:

-Rasto mayê tora peranê werdina to nêwazem, mayê tora peranê bakal (ka-lî) dê to wazem. Wexto ke, ti hewna dinya niyamebiyê bakalê to amebi tiya û nan werdibi, mayê peranê ey wazem, nano ke to ewro werd peranê ey tornê to dê bidê.

Nê qisan peyra lajek hêrs beno û destê xo çekeno xo tûnik, ewneno ke pereyê cinê qîm nêkenê û wayir dê wardengehî ra vano: "Pereyê minê qîm nêkenê, ez se kirî?"

Wayirê wardengehî vano:

-Verî pereyê ke, to de estê, înan bî-di, pey ra jî, zere de firaqê lîminî (qilê-rîn) estê, înan bişîwi. To ke jû meng firaqî şiwitî, deynê bakal dê to qedeno û ma jî to viradem. O wext xo rê senî kenê, kêfê to yo.

Lajek firaq şiwitin qabûl keno û wexto ke, firaqî şiweno wina vano:

Bakal bakal, bakalo bêbext

Bakal bakal, bakalo bêxeyr

Bakal bakal, bokan ti mi rê bigeyrê.

Bakal bakal, boka dara to xo doşînî.

Bakal bakal, boka viro bêro to ro.

MEMED DREWS

Rojê jew lajek wazeno şiro şaristano gird û xo rê bixeftiyo. Co-ka jî, lajek hema şino xarac bilêt geno û dano piro kewno raya şaristanê girdî. Senî ke, otobos rese-na şaristan, lajek yeşo war û hetê miya-nê sûka kewno ray. Heveyê şino ewne-no jew wardengehî (loqanta) sero nûsto ke, kam nê wardengehî de nan bûro,

peranê ci torinê ci no bido. Lajek senî ke, nê niwisî vînenê û xo de wina vano: -Pîzeyê mi veyşano û pereyê mi jî tayn ê, ez xo rê şirî nê wardengehî de nan bûri, çi wext ez zewjîyawa û tornê mi bî, wa ê o wext peranê werdina mi bidê. Xora wardengehî sero winî nusyawo, la belê ez ancî wayir dê warden-gehî ra pers kirî, ek rast o, iyê peranê

BIXELAT...

XAÇEPIRSA BIXELAT (80)

XAÇEPIRSA


L	E	Y	L	A	K	A	P	L	A	N
Y	E	K	S	E	R	R	O	R		
A	L	K	A	L	Î	W	A	S		
A	Z	A	N	Î	V	N	A	N		
A	X	T	Û	R	M	E				
N	I	N	A	S	Î					
O	X	A	N	E	T					

PEYVA VEŞARÎ → RASEBÎ

Navekî jinan	Laş	Bi farisî av	Dijberê na	Şeva reş	Hejmerek
Helbest vanekî kurd	qels, zefî	Ne biyan	Bi tirkî DYA	Naverast	
Aqilmend			1		
Şil	2		Bê şernî		
			Cinavkek		
		Hejmerek		Cinavkeke	Di iskan-bilê de yek
		Nave darekî		Bêbextî	
Herêmeke Kurdistanê	Stranbêje ke kurd	...rês	Pasgîrek Bi kurdi Newroz		Sembola argonê
	4		5		
			Biyan Saziya fezayê ya DYA'yê		
Kûzekûz					
Oksîjen					
	Kesê jî Bişarê Tevgera hewayê				
Bûn dema borî		Tûjîk	3		
Helbestvanê kurd (wêne)					
		Ezi			

Bersiva Xaçepirsa 78'an

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi rîya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 80'yî pirtûka Beyanî Şahîn (Lêkolînekî Qicik Li Ser Zimên) e



Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nirxandî, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.

Pênc kesên ku xelata xaçepirsa hejmara 78'an Pîroz Yildırım/ Amed, Gazi Keleş/ Bartın, Aynur Salar/ Qers, Rahmî Canbolat/ Birecik, Hîhsên Başûrî/ Stenbol

PEYVA VEŞARÎ →





Ferhengok

ayîn: dab û nêrit, orf û adet
asayî: normal
awarte: îstisna
barûdox: rewş, zurûf, hal
baştirîn: tiştê herî baş (en iyi)
bendav: baraj
berevajî ve yekê: bilakîs, tersine
bêpar man: jêman, mahrûm bûn
bêzirav: tirsonek, bizdonek
bi sanahî: bi hêsanî, bi asanî
binbarî: berpirsiyarî, mesûliyet
bijarte: elît, mûmtaz (seçkin)
binbîr: binhişîn, (bilinçaltı)
bîrewer: bîranîn, hatirat
biryargeh: qerargeh
bizav: tevger, hareket
cihê: cuda
çawati: nîtelik
dêrûnî: ruhi psikoloji
dûmahî: dawî, paşî, talî
destkeftin: kazanım
diwaroj: pêşeroj, dahatû, ayende
erk: peywîr, vatînî, wezîfe
guncaw: lêhatî (uygun)
gîrîngtirîn: tiştê herî girîng
giyandar: Giyanewer (canlı)
harîkar: alîkar
heman kat: eynî wext
hempa: emsal
hevalbend: muttefik
heyber: mehlûq (varlık)
hêzên dijber: derdorên muxalîf
hilpişkîn: hilpekin (atılım)
hûrnêrîn: dahûrîn, analiz
hincet: ûşt, bahane, mahne

kesayeti: kesitî, kesatî, şexsiyet
komaleyeti: komelatî, civakî,
kulîbîn: harbûn
kuşeti: henek
likulimîn: aliçîn (takılmak)
navgînên ragihandinê: hacetên komunikasyonê
nîfs: jenerasyon, nesil
mêjû: dirok
mêtingeh: kolonî (sömürge)
mafdar: biheq (haklı)
pest û pêkutî: zilm û zordarî
pelîşîn: hilweşîn, rûxîn
pêpêlûk: nêrdivan
qewaz dan: di ser re gav avêtin
qorik: pişt, sirt
regez: nîjad, esl, reh
rêje: nîsbet (oran)
rêz: misra
serborî: serpêhatî, serûven
serdem: heyam (dönem)
serinc rakeşîn: bal kişandin,
taybetmendî: taybetî, xûsîyet,
tawanbarkirin: suçdarkirin
temen: jîn, emr
tevkujî: komelkujî
tiredîn: delodîn (delidolu)
tomik: kend û kosp
wêjevan: edebiyatçı
weşankar: yayıncı
Wêrek: Cesûr
xeternak: bi talûke
xwendegeh: dibistan, fêrgeh
xedar: dijwar, giran
zarî: zarok, mindal

Birayê minê hêja û delal, nivîskar û rojnamevan Hüseyin Deniz 10'ê gelawêja sala 1992'yan li Serêkaniyê bi destê kontrayan hate qetilkirin. Ew bi serbilindî kete nav kerwanê şehîdên çapemeniya azad. Birayê min Hüseyin şehîdê azadiyê ye, em di şêş saliya şehîdbûna te de bi hurmet te û hemû şehîdên welat bi bir tînin. Em te ji bir nakin tu her dem di dilê me de dijî.



Li ser navê malbata wî, xwişka wî Edla Deniz

Gira li hemberî dijmin
 Di dilê me wekî gogeke ji êgir e
 Evîna me ji bo welat ji
 Ararat berzîr e
 Tola şehîdan di dilê me
 pêl dide
 Soza me
 Ji bo welatekî azad e
 Lewre,
 Soz rûmet e
 Rûmet divê nekeve bin lîngan



Heval Delil (Hakim Calp)
 Di 1994'an de li Bişêriyê şehîd ket
 Em wî û hemû şehîdên azadiyê bi
 hurmet bi bir tîne
Şehîd namirin

Li ser navê malbata wî Eşref û Sinan Calp

Bînemale paşverûyekey Barzanî xo be mîratgirî kurd dezanî

Serkirdayeti Barzanî-Nêçîrvan le Kurdistan da we le duwa duwayekani sedeyî bîst da herdu xesletekey koneperistî û derebegayeti be pîstirîn şêwe le xoyan da ko kirdotewe be şêweyek ke:

1. Carê ew serkirdayetiye be hemû meqayîsekanî zanistî ramyarî koneperist e. Çünke neraziye be hel û mercî ramyarî le arada ke hiç orhêdekîşyan le hiç katêk da be çûnberew pêş nebûwe. Le katekanî nêzikî duway rapêrînî beharî 91 da katêk beşêk le cemawerî xelkî Kurdistan le dilpakî û dilsozî xoyanewe wele perosyan bo yekgirtinî rêzekanî gel, le

xîtabe neklokekani Barzanî debûnewe ke çî ewîş lem ser bo ew serî qisekanî pîrbûn le dilgirtin, we her ewendey mabû tase qor û tope qomaşêkî reş be ser xelke amadebûweke da bibexşetewe.

2. Katêkîş ke ew xîtabe bê serûberane xelkî pê sard nedekirayewe we amancekey xoy ne de pêka, inca kewte şer firoshtin be des-kewtekanî rapêrînî gel û Partî Kirêkarani Kurdistan ewîş be fit û yarmetî heme layengê faşistî Turkiya.

Ke êsta êdî le hemû katêk ziyatir bo hemûwan aşkira bûwe be xeyalî gendel û reşî

xoyan le layek detwanin Partî Kirêkarani Kurdistan nehêlin, we le layekî dîkes rijemî faşî tirk razî deken we emêş bir û rayî binemaley Barzanî ye. Em xeyalegendeleş wa xoya deka ke binemaley Barzanî xo be mîratgirî gelî kurd dezanin, nimûneş be lay ewan nabê hiç birêkî tir, yan hêzêkîtir ke le berjewendî gelî kurd da xebat bikat desthelatdarî hebêt le Kurdistan da, goma têda niye ke be hêzkewtinî her birêkî pêşkewtin xwazane ebête hoy nehêlanî binemaley Barzanî.

FERHAT ZEBARÎ

Rojnameya Hefteyî
 (Haftalık Gazete)

Li ser navê
 Zerya Basın ve
 Yayıncılık
 San. Tic. Ltd. Şti.
 (adına)
 Xwedî (Sahibi)
 CELALETTİN
 YÖYLER

NAVNÎŞAN
 Ayhan Işık Sk. No:23/3
 Beyoğlu / İSTANBUL
 TEL-FAX
 (0 212)
 251 90 13

Gerîndendeyê Weşanê
 (Yayın Yönetmeni)
 SAMİ TAN

Berpîrsê Karên
 Nivîsaran
 (Yazı İşleri Müdürü)
 M. SALİH TAŞKESEN

Berpîrsê Saziyê
 (Müessese Müdürü)
 TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE
 Yeni Asya Matbaacılık
 A.Ş.

BELAVKIRIN
 BIRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME
 (Temsilciliklerimiz)

Brüksel:
 Medenî Ferho
 32 532 721 12 03

Suriye:
 Jan Dost
 Helîm Yûsiv
 Berlin:
 Silêman Sîdo
 49 30 69 00 26 95

Hannover:
 Selîm Biçûk
 49 572 18 13 60
 Munchen:

Mahmut Gergerli
 49 871 67 08 84
 Stockholm:
 Robîn Rewşen
 46 87 51 05 64

Bonn:
 Ahmet Baraçkîç
 49 228 66 62 49

Hollanda:
 Ferhat Zebarî
 31 104 85 55 48

Kurdên Kanadayê ji bo çand û hunera xwe têdikoşin

Ji ber ku Kurdistan her tim biye qada ser, kurd ji her tim bûne penaber. Ji wan penaberan hinek ji li bajarên Kanadayê yam cur bi cur bi cih bûne. Lê ji ber nebûna dewlêtoke kurdan mafên wan em bingehin ji di astêke hemî nizim de mane. Her wiha li Kanadayê ji komaleyên kurdan em cur bi cur hene û dibistanên ji bo parwendehiya zanokan bi zimanê wan ê zikmalî ji bo demên kurt hatine vekirin, lê ew sazî demêke dinêj li ser piyan nemane. Ev nivîs bi gîştî rewşa kurdan li Kanadayê dijin nişan dide. Nivîskar nivîsa xwe bi dewleta hevalên nişandibû, lê ew li gora zimanê rojnamayê hate guhartin, em bi vî awayî pêşîya xwendevanên xwe dikin.

Piştî ku rûdanên van dîmahayan bi serê kurdan de hatin, kurd bi rengekî gelek berfireh belavî hemû cihanê bûn, bi taybetî welatên Ewropaya Rojava, Amerîka û Awistralyayê. Hejmarek ji van kurdan qesta (koç) Kanadayê kirin.

Heta babetê me bi sanahî lê bêt bo şrove kirinê, baştir em bizanin kanê kengî kurda bo cara yekemîn qesta Kanadayê kir û jimara wan çi ye niha û digel roni kirinên din.

Dibe ku kurd wekî take kes, hebin ji mêji da hatibin Kanada. Lê bo cara yekemîn wekî bi rengekî kom hatin dizivire bo salên 1975-1976'an. Dema ku şoreşa Kurdistana Başûr tîk çû wê demê nêzikî 100-150 kes bi hev re hatibûn.

Mişextbûna kurdan rawestiyaye li ser kawdanên tê de dijiyan, çend barûdoxên xerab bûne egera hindê ku hejmareke mezin welatê xwe bihêlin. Bo nimûne rûdanên 1988'an, 1991'ê li beşa başûriyan, rûdanên berdeham li parçeyên Bakur û Rojhilat. Piştî hatina komên mezin li der û berên salên 90'î niha kurd digihne nêzikî heşt hezar kesan.

Demê panaberan tînin Kanadayê sistema vî welatî hewl dide ku komên ji yek regezî belav bike bi ser hemû bajarên xwe de. Lewma kurd ji bi rengekî cur bi cur belav bûne li hemû deverên Kanadayê. Kanada welatekî gelek berfireh e. Wekî tê zanîn zêdetir ji 10 dever û hikûmetên navxweyî lê hene; kurd li hemû bajar û deveran hene, li bajarên mezin ên wekî Toronto, Vankover, Montreal, Kalgary û Ottawa bi hezaran Kurd hene.

Rewşa Kurdan li Kanadayê gelek baş dibe, komelayetî, aborî, ramiyarî û hwd. Lê niha mijarê me li ser barê civekî be û li demên bê emê behsa warên di ji bikin.

Kurd û barê civakî

Dibe ku rewşa komelatî ya Kanadayê bo hemû milletên Rojhilat wênayekî xerîb be; bi taybetî milletên çand û ayin reftarên xwe bi rengekî gelek aşîkar jêk cuda dibînin. Helbet kurd wekî milletekî rojhilatî, çand û ayin û pêsketinên rewşinbiri û teknoloji digel milletê Kanadayê heye. Êdî çi raste û xwe (rasterê) yan ne raste û xwe wê tesîra xwe li ser rewşa komelayetî ya kurdan wê bike; rastiyeke heye di sistema Kanadayê de ew ji gelek karekî baş e, ew ji ewe ku dewleta Kanadayê harî kariya (alî kariya) hemû milletên penaber dike ji bo jîbîmekirina ziman û çanda xwe. Ji bo nimûne xwendegehan vedike bi zimanê wan milletan an harî kariya wan diket bo vekirina bingeha çandî ji bo parastina pênasî (nasnama) milletê xwe. Ger bîn li her bajarekî Kanadayê binêrin wê bi dehan xwendegehan bi zimanên cur bi cur dibînin an bi dehan dezgehên radyo û tele-



Dîmenek ji şahiya kurdên Kanadayê

vîzyon û kovar û rojname û bingehên komelayetî bibînin, hemûyan ji dewleta Kanadayê harî kariyê dike.



Li Kanadayê di pirozkirina Newrozê de hunermend Merziye Rezazî tê dîtin

Di vê barê da kurdan ji hewl dane bo vekirina xwendegên kurdî û danîna bingehên hunerî û çandî. Nimûne bo van çendan li Ottawa bo nêzikî saleke xwendegha zarokan bi kurdî hebû yan li Montreal bo demê 3 mehan an li Windsor û Toronto radyo û tv hene û çendîn kovar derketine ji wan; Roja Nû, Kurdistan, Jiyan, Aloke hwd.

Li her dera ku kurd lê xem ji parasitina pênasî xwe kirine. Lê hemû demêkê pê rabûne û demêke kurt bi dîmahî hatiye û neşiyane berdehamiyê pê bidin. Helbet dibe ku gelek sedem hebin bo vê çendê, lê ya ji hemûyan girîngtir ew e ku kurd bi çi karan ranebûne bo çi? Eger ji ew e ku kurdan welatekî serbixwe nîn e; lewma ji hemû dibin komel, komaleyên cuda

cuda. Kurd heta niha bi rengekî germ Newroza di gêrin, li her cihê lê dijîn şahiyên jin anîn û derketina bo seyrana bi rengekî komel dikin. Kurd bi şanazî cil û bergên xwe di nav komaleyên Kanadayê de li xwe ber xwe dikin. Zarokên xwe bi kurdî bi nav dikin. Her çende li Kanadayê xezan (malbat) zor biçûk in, lê piraniya xezanên kurd wekî xwe mane bo çekirina zarokan.

Kurd çimkî miletekî bindest e, herdem hez kiriye tîkeliya milletên Kanadayê bike, da ku bişên li dîv zanîna xwe arîşeya milletê xwe bo wan bibêjin; heta niha kurdan serinca gelek kesan ji milletê Kanadayê rakêşaye û bûne heval û dost. Ji ber ku demek zor nîn e kurdan qesta vî welatî kiriye, hê bi germî neşiyane (nekarîne) bi çand û doza xwe ve balê bikişînin; lê wekî me berê ji destnîşan kiribû diwaroj wê çawan be zor girîng e. Wekî diyar heta niha çend rûdanên xwekustîne peyda bûne û rêjeya jêk vebûna (ji hev veqetîn) jin û mêran roj bi roj bilind dibe û hêdî hêdî zarok zimanê dayikê wînda dikin. Dibe ku ev cure kêşe zêdetir lê bîn, eger kurd bi rengekî yekgirtî xema avakirina bingehên çandî û hunerî û xwendegên kurdî bo zarokan nedin. Bo çi çare bi rêka komeleyatî ne bi bizavên di? Çimkî çand û komel hemû kurdan vedigire ne mîna îdeolojiyêke taybet e û berjewendiyên çînekê yan komekê dike; çand her kesê vedigire û dibe temamkirina bizava milî. Her wisa ev welatê Kanadayê hevkarîyê bi vê rê dike, lê riyên din bin dibe ku astengên wîsan bêne pêş, bibin egera ji destçûna pênuşa xwe li vî welatî. Ev rastî her kesek heta radeyekê pê agahdar e. Êdî baştir ew e ne ji eyda kelê û seyrana rûbarî her duyan bibin.